# Di Nav Modernîzasyonên Der-Ewrûpî de Tecrûbeya Kurdan*

## The Practice of Kurds in Non-European Modernization

Ramazan ÇEÇEN**

**PUXTE**:

Wekî gelek pêkhateyên dewra Osmaniyan, di nav Kurdan de jî fikrên Ewrûpî di serê sedsala bîstan de li Stenbolê peyda bûne. Li gor taybetiyên xwe yên sereke yekûna van fikran teqabûlî modernîzasyoneke der-Ewrûpî dike. Lê di tunebûna îmkanên dewletê de tecrûbeya Kurdan ji modernîzasyonên Şerq-Îslamî vediqete. Pêkera ku di nav civatê de fikr û jiyaneke modern binecî dike, ne meyla burokrasiya dewletê ye, îrade û enerjiya kesekî xwenda ye. Ev kesê ku pêbendî îdealên fikreke ronakger e, wisa bawer dike ku bi rêya dibistan û perwerdeyê, jiyan û civateke aqilger, zanist û fen, sazkirina îdareyeke meşrûtî miletê wî jî bigihîje karwanê esrî yê demê. Ji bo vê yekê ronakbîrê Kurd her wekî di bunyeya miletê xwe de şiyarbûn an vejandineke netewî saz bike, hem ajîtasyoneke ku berê wê li hesasiyetên netewî ye pêk aniye û hem jî xwediyê eleqeyeke akademîk e ku berê xwe daye naskirina çand, edebiyat û dîroka xwe. Heta maweya destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem, gotarên civakî yên ronakbîrê Kurd vê rastiyê destnîşan dikin.

**Bêjeyên Sereke**: Modernîzasyon, Kurd, perwerde, aqil, fen, ronakbîrên Kurd, ronakger, gotar.

**ABSTRACT:**

As in many other Ottoman communities, among Kurds European thoughts emerged at the beginning of the twentieth century in Istanbul. According to their own main features, the total of those thoughts were non-European ones. However Kurds' experience differs from

* Ev gotar feyza xwe ji beşeke teza doktorayê digire ku ev tez bi navê *Di Rola Ekola Hawarê Di Binecîkirina Cureyên Edebiyata Kurdî ya Nû De (Li Ber Temaya Modernîteya Ronakger)* pêşkêşî Zankoya Zaxoyê beşa Kolêja Edebê bûye.

** **Wanebêj, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye /** Lecturer, Mardin Artuklu University, Living Languages Institute, Kurdish Language and Culture Departmant, Mardin, Turkey.
e-mail: remalan7@gmail.com

oriental-Islamic modernizations because of absence of state. The determinant that place modern thoughts and lifestyle is will and energy of of a literated person rather than bureaucratic tendencies of state. That person who has ideals of enlightment thoughts believes that his nation can reach then modern train via schooling and education, a rationalist life and society, science and technique as well as founding a constitutional government. Therefore Kurdish intellectual as he leads an awakening or a national revive he both formed an agitation of national sensitiveness and has an academic interest which head for introducing his own culture, literature and history. The social articles of the Kurdish intellectual until the beginning of the First World War emphasizes this fact.

**Keywords:** Modernization, Kurd, education, reason, science, Kurdish intellectual, enlightment, article.

## 1. DESTPÊK

Tecrûbeya Kurdan a modernbûnê, cureyekî xaka Şerq-Îslamê ye, lê ji hinek aliyan ve tecrûbeyeke xweser e. Ev xweserî ji bikerên vê modernbûnê, ji ronakbîran diwelide. Ji ber ku hin fikrên Ewrûpî bi rêya nivîsên ronakbîran ketine nav jiyana raya giştî ya Kurdan. Bi gotineke din Kurd, bi rêya çalakiyên ronakbîrên xwe ji fikriyata esrî ya Rojavayî/Xerbî hayedar bûne.

Di heman demê de naveroka bernameya ronakbîrên Kurd pêbendî mîraseke ronakger e, ango stûnên xwe li ser îdealên wê mîrasê ava kiriye. Yekûna vê ramana "nû", pêşketin (progress/tereqqî) mîna diyardeyeke zanistî û teknîkî ya demê dîtiye û fêm kiriye. Ronakbîrê Kurd ê ku gelek caran aktîvîstekî netewî ye, wisa bawerî pê aniye ku pêşketin dê bi rêya xwendinê, aqil, sazkirina civateke aqilger, xwenaskirinê, çêbûna hesta netewî, çêkirina rêkeftineke civakî, bi tenwîreke li dijî adet û xurefeyan bi dest dikeve. Madem mirovahî ber bi îstiqameteke wisa ve diçe, nexwe lazim e civat û jiyan jî li gor vê îstiqametê cardin saz bibe. Yanî ronakbîrên Kurd pêşketin û şiyariya netewî ya ku hevtemenê hev in, bi ferhengeke Ewrûpî xwendiye. Di vê rêyê de bi çalakiyeke nivîskî hem ajîtasyoneke netewî kiriye û hem jî bi meraqeke akademîk bi çand û dîroka miletê xwe mijûl bûye, kêşeyên wê aniye ziman.

Ji bo destnîşankirina van yekan ev gotar dê berê xwe bide "destpêk"a peydabûna van fikran û dirûvgirtina wan a beriya Şerê Cîhanê yê Yekem. Lêbelê ji bo eşkerekirina paşxaneya vê destpêkê, divê pêşî bi kurtî be jî, derbarê fikrên modern ên malê Ronakgeriyê û modernîzasyonên der-Ewrûpî de hin îzeh bên kirin.

## 2. LI EWRÛPAYÊ MODERNÎTEYA RONAKGER

Maneya ferhengî ya modernîteyê (modernity), "nûjenî" ango "rewşa nû" ye. Lê di warê jiyan, felsefe, aborî û civakî de navê guherînên mezin e li rojavayê Ewrûpayê.

Di van guherînên mezin û bingehîn de jî rola Humanîzm, Reform û Ronakgeriyê heye. Bi mirovheziya Ronesansê re însan biqîmet bû û bû pîvana her fezîletê. Reform bi xwe re dunyewîkirina dîn anî, rola dîn cardin saz kir. Ronakgerî li ber çiraya aqil, li dijî bawerî, adet, xurafe, hukim û dinyaya kevin şerek da destpêkirin û xwe wek çareserkirina zanistî ya hemû nepenî û diyardeyan îlan kir. Di ber van guherînên bingehîn de modernîte bû navê rewşa nû ya ku aqil, zanist, sekulerî, azadiya însan û îradeyê mohra xwe lê dane. Lewma digel serboriya wê ya têkel û pirhêl, ji bo pênasekirina modernîteyê, çend xalên hevbeş hene di nava lêkoleran de: Rasyonelkirina civakê, sekulerbûna jiyanê, pêşketina zanistî, fikra neteweyî, guherîna fêhma zeman û qîmetbûna însan ango mirovhezî.

Bêguman ne mumkin e û hewce nake mirov hemû guftûgoyên li ser modernîteyê neqil bike. Rast e ku di vê behsê de du şîrove hene: Li aliyekî “modernîteya ronakger” ku siyaset, aborî, perwerde, çand û civakê li dora fikreke maqûl (rational) organîze dike û zanîna ku ji hêza aqil diwelide dixe bin xizmeta însan. Li aliyê din “modernîteya tehekûmhez” ku ilm û zanîna bi aqil ketiye dest ji bo kontrolkirina siruşt, civak û civakên din bi kar tîne! Di qonaxa yekem de aqil, sekulerî, karbeşî, milkiyeta şexsî, takekes, çalakiya bikerbûnê, coşa şoreşê, pêşketina fennê, têkbirina xurafeyan, tayînkirina qedera xwe, hizra ku civatê li dor neteweperweriyê saz dike, otorîteya ku li gor qanûn û mafan sînor dibe îlham dide modernîteyê. Di qonaxa duyem de aqilê ku bûye amrazekî tehekûmê, takekesê ku parçe bûye û bûye xerîbê xwe, şoreşa ku cihê xwe daye hêvîşikestinan, çavbirçîbûna rojavayî ya ku jê emperyalîzm û mêtinkarî welidiye, otorîterbûna dewletê ya ku welatî perçiqandiye, fenna ku bûye cureyekî endustriya şer jî zemîna şîroveyeke rexneyî aniye meydanê. Jixwe şîroveyên modernîteya tehekûmhez ên ku feyza xwe ji xwendinên postbinyadger, postkolonyal û postmodern werdigirin malê salên 70 û 80yan in. Yanî diyardeya ku modernîteyê bi kodên tehekûmhez dixwîne ji bo Kurdan jî tiştekî nû ye. Yeka din di tunebûna statûyeke otonom û serbixwe de saziyên çandî yên Kurdan (rojname, kovar, kitêb, dibistan, komele hwd.) ne temendirêj in û ji ber destwerdanên serdestan her carê mecbûr mane ku ji “sifir”ê dest pê bikin. Vê yekê jî tesîr li ronakbîran kiriye ku rojeva wan a modern ji dawiya sedsala 19an heta nîveka sedsala 20an bi mijarên modernîteyeke ronakger/tenwîrî tije be. Lewma di vê gotarê de ev aliyê modernîteyê derketiye pêş û bûye pûsûleyek ku em zîhniyeta ronakbîrê Kurd fêm bikin.

Ji bo gelek lêkoleran (Touraine, 2004: 24; Berman, 2003: 35; Russ, 2011: 396; Vali, 2010: 44; Loo&Reijen, 2006: 187) xaleke hevbeş e ku modernîte bi fikra rasyonelkirinê, avakirina civateke rasyonel û sekuler, serdestkirina jiyaneke aqilane re têkildar e. Aliyekê wê jî kategoriyeke dîrokî û aborî ye (Giddens, 2010: 28, 29) ku piştî feodalîteyê rû daye û bûye navê dewra pîşesaziyê. Pîşesazî ango endustrî, bi xwe re pisporî anî, di pêvajoya hilberînê de hêza maddî zêde kir, ji tibê bigire heta

teknîkên şer hûrbînî û hûrzaniyek da peydakirin, jê şoreşeke aborî û teknîkî welidî. Vê şoreşê bi keşifkirina neftê re zêdekirin û bikaranîna makîneyan derxist pêş. Vê yekê li ser siruştê guherînên mezin çêkir. Bi hêza teknîkê re zeptûreptkirina siruştê hêsantir bû, lê rê li ber texrîbata wê jî vekir.

Têkçûna împaratoriyan û di şûna wan de hêdî hêdî çêbûna netewe-dewletên burokratîk, diyardeyeke din a vê pêvajoyê ye. Kapîtalîzmê, bi xwe re bazareke hevbeş, hêzeke merkezî anî. Pê re hêza çeperan tesfiye an kêm bû; çîneke nû ya bajarî û erbabê ticaretê (bûrjûwazî) peyda bû. Di şûna esîlzadebûneke şecereyî de hêza sermiyanê û nirxên wî yên nû cih girtin. Ji bo bazareke hevbeş zimanekî ku jihevfêmkirinê hêsan dike jî di vê pêvajoyê de peyda bû. Zaravayeke ku bi hêz û hukmê bûrjûwaziyê bilindî asta zimanê netewî bûye jî malê vê dewrê ye. Elbet di vê merheleyê de têkçûna pîroziya zimanê dinî (ji bo Xirîstiyaniyê, Latinî) û di şûna wê de hêdî hêdî binecîbûna zimanên herêmî jî rewşeke modern e. Wekî ku Benedict Anderson (1995: 60) jî tîne ziman kapîtalîzma matbû, rê li ber zimanên nû yên îdarî vekiriye, sabîteyek (standardîzasyon) bexşî wan kiriye, heta alîkarî kiriye ku ji bo endamên vê cemaeta xwenda, hebûna xwe ya dinyewî û takî di nav cemaeteke muxeyyel (netewe) de tesewir bikin, xwe wek parçeyê neteweyekê bibînin.

Bêguman aliyê herî hêzdar ê vê modernîteyê, felsefeya wê ye. Ev felsefeya ku pala xwe dide aqil, ji vî aliyî ve ji yên berî xwe cuda ye: Dema jiyaneke rasyonel peyda bû dê zanist bibe amrazek û ew newekhevî, tirs û metirsiyên ku rabirdûyê dagîr kirine berteref bibin û li wê derê îradeya însan tecellî bibe. Ji ber ku di civata modern de çalakiya ronakbîrî, qanûn, desthilatdarî, perwerde, aborî, jiyana giştî û şexsî li gor silsileya rêgezên rasyonel tên sazkirin. Di vê maneyê de modernîteya Ronakger, dîroka pêşketineke aqlî ye.

Wekî aqil, di nav vê ronakgeriyê de qebûlkirina qanûnên siruştî û huqûqa siruştî jî wesfek e. Çawa ku di muhekemeyê de aqil besî xwe ye, ji bo naskirina rûdanan hewce bi Dêrê nîne, di zanîna qanûnên siruştî de jî wisa ye. Însan çiqas siruştê nas bike, ewqas li ser karîger dibe, însan û siruşt nêzikî hev dibin. Ji viya jî "faydeya civakî" derdikeve. Çavkaniya nirxên civakî, bi faydebûna wê tê pîvan. Dema berjewendiyên kom û zûmreyekê tev li van nirxan bûn, ew xerab dibe. Rêya herî maqûl di çêbûna qanûnan de ev aliyê siruştî ye ku faydeya civakî (selahiyet) derdixe meydanê. Jixwe ji ber pêdiviyên giştî însan carna ji mafên xwe feraxetê dikin, lê ev yek ne bê şert û merc e. Kengê hukimdar acîz û bêçare bimîne ku nikaribe aramiyê dabîn bike an jî bibe zordestek, li dijî wî serhildan (qiyam) mafek e. Ev mafê serhildanê di nav kakilê rêkeftineke civakî de heye û meşrû ye. Di çêbûna dezgehê siyasî de ne qanûnên şecereyî, lê rizaya rêkeftinê girîng e.

Tam di vê kêliyê de Şoreşa Fransiz a ku neteweyê bi aqil re, welatî jî bi fezîletê hevmane dîtibû, bi îlankirina *Danezana Mafên Mirov û Welatiyan* re dawî li dezgehê

kevin anî, însan dawetî azadiyê kir û diyar kir ku ew îmtiyazên dînî û toreyî yên monarşiyê zexim dikin, yekser nayên qebûlkirin (Touraine, 2004: 33, 70). Vê belgeya ku bû çavkaniyeke bingehîn a exlaqekî şexsî, berpirsiyariya bikerî jî teşwîq kir. Civaka siyasî, dê li ser rêkeftineke ku rizaya vî takekes û welatiyî pê heye bê avakirin. Ev yek avakirina şerîeteke dinyewî ye ku li wê derê mafên siruştî yên wek mulkiyet, azadî, wekhevî, ewlehî, li dijî zordestiyê serhildan hwd. bingeha civakeke sivîl pêk tînin.

Bêguman pêwendiya fikra huqûqa siruştî bi dunyewîbûna/sekulerbûna Xirîstiyaniyê re, bi cihguhertina bikeriya îlahî û bikeriya însanî re, heye. Bi Reformê re ev rê vebûbû. Protestanî, zemîneke dewlemend a laîkbûnê derxistibû holê. Li gor pêşengê wê Luther, ji bo ku mirov nêzîkî kelama Xwedê bibe, tu navbeynkar ne lazim in û heta divê navbeynkar tev bên terkkirin. Sofîtî û adetên Dêrê nikarin mirov bigihînin selametê, ji bo selametê ne pêkutî, lê "evîneke adil" divê. Dîndarê rasteqîn ne bi rêya sofîtiyê, bi ya îmanê xwe digihîne Xweda û baweriya xwe bi lutfa wî tîne. Ev fikir bi awayekî lîberal hatin şîrovekirin û jê exlaqekî Protestanî welidî.

Felsefeya Ronakgeriyê ne tenê di warê fikr de bi ser ketibû, di warê aboriyê de jî piyaseyeke rasyonel bi dest ve anîbû ku tê de exlaqê Protestaniyê serdest bûbû. Ji sedsala 18an vir ve, bi pêla mezin a Şoreşa Fransiz ve, qamûyeke modern peyda bûbû û daxwaza nûjeniyê di warê siyaset, aborî, huqûq û çandê de bergewde bûbû. Ronakgeriya ku bûbû aliyê fikrî û felsefî yê vê lêgerînê, însan dawetî berterefkirina xurafeyan dikir, digot sêhra li ser bûyerên dinyayê bi aqil ronî dibe; her tişt xwediyê sebeb û encamekê ye; mirovahî ber bi dahatûyê ve di nav "pêşketin"ekê de ye; berê dîrokê li avadaniyeke civakî, kamilbûneke siyasî û azadiyeke takekesî ye û ev yek li her dinyayê diyardeyeke muqedder e... Hinek jî ji ber vê fêhmê modernîte, di nav serdemeke nû de wek pêşketineke aborî jî hate dîtin û qebûlkirin. Pêşketineke ku bi qewlê Weber (1993: 25, 155) tê de exlaqekî aqlî yê Protestaniyê rû dabû û şexs li gor qabîliyet û îradeya xwe hukmek dida, li gor meşrûiyetekê karê xwe dikir. Di nav karên îdarî û civakî de, ji malbatê bigire heta huner, dîn û aboriyê sazkirina civateke rasyonel dê li dar bikeve. Pêşketin jî dê bi destkeftiyên aqil re mumkin bibûya, dinya dê bibûya ciyê xêrûbêrên van destkeftiyan. Bêguman dê dîn û bawerî ji holê ranebûya, lê dê bikişiya kuncikekî ji çavê qamûyê dûr. Di eslê xwe de şerhên Ronakgeriyê yên li dijî dîn, ji rika tifaqa Seray û Dêrê der bûbûn. Di monarşiyan de îqtidara siyasî xwe dispart huqûqeke îlahî û gelek caran ji bo vê yekê otorîteya dînî ji bo armancên xwe bi kar dianî. Hê di derketina Protestaniyê de li dijî vê hevkariyê îtirazek hebû. Ji ber ku Protestanî, li dijî rizîbûn, îmtiyaz û nifûza papatiya jirêderketî protestoyek bû. Selamet, bi aqil û edaletê dihat, ji bo wergirtina kelama Xwedê, rakirina hemû qasid û rabiteyan pêwîst bû.

Çeperên sekuleriyê bi Protestaniyê re firehtir û belavtir bûn. Îman bi zanîn û şiûrê jî mumkin bû. Faydeya civakî an bi gotineke din xêra civakê, bû navê giştî yê

aqilbûna îradeyeke giştî. Jê qaîdeyeke nû rû da: Belê însan li dêrê, li malê, li qada şexsî evdek e, lê di qada giştî de êdî "welatî"yek e, li wê derê di şûna wijdana wî de qanûn û huqûq heye. Jiyana aborî, berhevkirina mal jî dê di ber vê pêbawerî û temînatê de bi rê ve biçe. Jixwe sermayedar, yanî tebeqeya xwenda ya bûrjûwaziyê ya ku nêzîkî fêhmeke wisa bû û ew bajarên dewlemend ên ku ev mezheb pejirandibûn (Weber, 1993: 30) di vê maweyê de hev temam kirin. Xala hevbeş a vî mezheb û exlaqê aboriyê, bû "kapîtalîzm". Wekî ku Weber jî digot (1993: 132) kapîtalîzm şiklek da pûl û pere û kedê; exlaqê bûrjûwaziyê nirxên wê yên madî tayîn kir û vî exlaqê nû kilîd li deriyê menestirê xist, gavên xwe ber bi bazara jiyanê ve araste kir.

Saziyeke muhkem a vê rewşê jî dibistanên nû bûn. Li Komara Fransayê bi Jakobenan re fersend çêbûbû ku bi îmkanên desthilatdariya xwe şiklek bidin neteweyê. Wan li ser navê desthilatdariyeke ku şefafiya civatê temsîl dike berê giyotîna xwe dan her wesfê reha, keyfî û paşverû. Li gor nezera wan çawa be tiştê qenc ê ji bo neteweyê, ji bo welatî bû jî. Lewma ev welatî lazim e di nav dibistanên esrî de bi perwerdeyeke rasyonel, fennî bihata disîplînekirin. Di vê maneyê de dibistan, hem însan ji kokên wî yên berê dûr dikir û hem jî alîkarî dikir ku însan bi agahiyên rasyonel yên dewra xwe tev li civakê bibe. Ev dibistan di heman demê de li gor çînên xwedî-îmtiyaz, cihê girseyeke gelêrî bûn ku bi ezmûnên beteref li wir dixwendin. Lewma li rojavayê Ewrûpayê ev dibistanên ha bûn ciyê afirê modernîteyekê ku xwe şoreşger, xelasker û azadger didîtin. Dibistanên modern, ew sazî bûn ku di şûna keyfîbûna exlaqê dînî de, zanîna qanûnên siruştî belav dikirin (Touraine, 2004: 27). Tiştê ku wijdana modernîstan rehet dike pariyek ev bû. Çinku ew di wê baweriyê de bûn ku tariyê ronî dikin. Ew ji bo qenciya siruştî ya însan û ji bo qabîliyeta wî saziyên mantiqî ava dikirin, baweriyek dida însan ku hurmeta azadiya her kesî bigire û kaînatê li gor aqilê xwe fêm bike, bi pêşketina zanistî re deriyê dilşadî, bereket û refahê veke. Li qubbeya esman, dê dîrok jî wekî tava aqil bibiriqî.

Elbet ji vê baweriyê ku dîrokê wek zanistekê dixwîne, fêhmeke din a modernîteya Ronakger derket. Aramî, nîzam, refah, azadî dema bûn qanûneke siruştî ya îradeyeke kolektîf, jê pêvajoyeke siyasî derket. Tiştê ku vê pêvajoya siyasî ya felsefeya Ronakgeriyê temsîl dike "fikra pêşketin"ê ye. Êdî ji her tiştê ku pêşketinê re dibe asteng hesabek divê, êdî têrî nake ku mirov rêya aqlîbûnê jî veke, divê mirov modernbûnê bixwaze, jê hez bike û civateke ku modernbûnê diafirîne saz bike. Li gor Touraine (2004: 78) modernîte fikrek bû, lê bi vê daxwazê re bû îradeyek. Ji bo civateke ku jê refah û azadî diwelide jî teknîk (fen) lazim e, zanistîbûneke bêteref a ku ji aliyê aqil ve tê bidestxistin pêwîst e. Ev rewş, di maneya herî besît de "pozîtîvîzm" e. (Emê piştre şahidî bikin ku meşrûbûn û serfiraziya vê pozîtîvîzmê li xaka Şerq-Îslamê çiqas hêzdar e, ji ber ku ew li ser navê "fenn"ê ji aliyê ronakbîr û mifessiran ve hema bibêje bê şerh hatiye qebûlkirin.)

Ev tev li Ewrûpayê cereyan kirin. Bi xetên berbiçav ji Ronesansê heta Şoreşa Fransiz û ji wir jî heta Şoreşa Pîşesaziyê ya li Îngilîstanê. Bi vê pêvajoyê re qaîdeyên ticaret û mûbadeleyê guherîn, qamûyeke nû ya rêveberî çêbû, bingeha dewleta bi huqûqê hat zexmkirin, di qanûnan de fikra faydeya civakî ya ku xwe dispêrê rehên sekuler rû da, hişmendiya welatîbûnê û welatparêziyê çêbû, çapa kitêban zêde bû, dibistanên modern derketin, nerît, îmtiyaz û baweriyên şecereyî zeîf bûn û ev modernîte bû navê felsefî û aborî yê azadî, şoreş û hukimraniya aqil.

## 3. LI DERVEYÎ EWRÛPAYÊ MODERNÎZASYON AN MODERNÎTEYÊN DERENGMAYÎ

Dikare bê gotin ku ew gelên ku li hember serkeftinên leşkerî û teknîkî yên Ewrûpî xwe muhtacî sîstem û kodên hegemonîk ên Ewrûpî dîtine, modernkirineke binecîger (îqameger) dane ber xwe, xwestine bi rêya "wergirtin" an "teqlîd"ê reforman bikin û bibin xwediyê normên Ewrûpî. Ev rê xwediyê rabirdûyeke nasyar e: Tê de qîmeta makezagonê, sînorkirina monarşiyê, mafên mirovî û welatiyan, jihevveqetîna qada giştî û şexsî, aqilgerî, takekesî bejn didin... Ev yek dema bi Ronakgerî û kapîtalîzmê re hegemonyayeke nû ya çandî çêkir û belavî dinyayê bû, ji perwerdeyê bigire heta cil û bergan, ji fêhma hunerî bigire heta tedawiya nexweşiyan, ji bo civatê jiyaneke nû derxist meydanê. Ev pêşketina berbiçav, erdnîgariyên ji viya mehrûm, sewqî endîşeyeke bi vî rengî kir: Emê çawa bigihin karwanê pêşketin û tereqqiyê, emê kêmasiyên xwe çawa çareser bikin, emê di kîjan waran de reforman bikin, emê ji "wan" çi wergirin?.. Di nava hewildanên Dewleta Osmanî (Tanpınar, 1985; Mardin, 2004) û Îranên Qeçerî de (Dabashi, 2008) em rastî vê rêçê tên. Yanî xaka ku muhtacî pêşketineke Ewrûpî ye, dê di warên aborî, siyasî û çandî de modernbûnê "bi îmkanên dewlet"ê bi dest ve bîne. Ya rast, di nav dewletê de ji burokrasiya sivîl û leşkerî elîtek kêmasiyê dibîne û dikeve li pey çareseriyê. Lewma li wan xakan modernîzasyon dibe helwesteke îradî, ew di nav civatê de peyda nabe, tê *binecîkirin* ango *îqamekirin*. Li ser rûyê vê hewildanê ji aliyê hîssî ve derengmayînek û teqlîdek heye. Lê ji ber dudiliyên dezgeha berê û îmkanên li ber destan têr nake ku modernîzasyon bêqusûr bi rê ve biçe. Kêmasî, ne şaşkirina pûsûleyê ye ango bi gotina Jusdanis (1998: 11, 12) ne terikandina rêya rast a Ewrûpî ye. Ji ber têkiliya asîmetrîk, modernîzasyon li gor modernîteya Ewrûpî çalakiyên xwe tam nikare zêde bike, di ber muqawemeta dezgeha berê de di binyada wê de "qusûr"ek peyda dibe û lewma di dawiya dawîn de ew hewildan wek "modernbûneke kêm û derengmayî" dimîne. Yanî modernkirinên der-Ewrûpî, ji aliyê îradeyekê ve tên birêvebirin, lê ji ber şertên taybet û kêmasiyên binyadî yên civakî, ew tam nikarin bibin wekî muadîlên xwe, di wan de tiştek kêm û dereng dimîne.

Di modernîzasyonên der-Ewrûpî de, kêmasî di warê teknîk û leşkerî de hatiye ferqkirin. Ya rast li hember pêşketina fennî û şikestinên leşkerî yên li ber hêzên

rojavayî, modernîzasyonên der-Ewrûpî nûkirineke leşkerî û teknîkî ji xwe re kiriye pêdiviyek. Lewma di nav çareyên pêşîn de, îslahkirin û nûkirina artêşê, li gor mantelîteya esrê sazkirina perwerdeyê û vekirina dibistanên "elefrengî" hene. Di navenda vê fêhmê de jî bêguman hewildaneke pozîtîvîst û leşkerî heye. Di eslê xwe de ji bo ku rengê vê "îslaheta nû ya pozîtîvîst û leşkerî" qenc bê fêmkirin, em ji tecrûbeya Dewleta Osmanî çend mînakan bidin, baş dibe.

**3.1. Li Dewleta Osmanî Nimûneyeke Binecîger**

Bêguman di nav modernîzasyonê de hewildaneke berevanî heye ku modernîteyê wek tehdîdeke xaricî dibîne. Ji bilî vê, modernîzasyoneke ku bi rêya dagirkerî û serîtewandinê çêdibe jî heye (Therborn, 1999: 62). Ya ku li cografyaya Îslamî dirûvek wergirtiye, ji van cuda nîne. Bi rastî jî li xaka Şerq-Îslamê, wekî gelek teşebisên din, modernîzasyon jî xwediyê karakterekî binecîger e. Ew tê çandin, avakirin, çêkirin, îqamekirin... Ax û zemîna wê ne guncav be jî, ew tê amadekirin. Li ser bingeheke kevin, "fikrên teze" tên çandin. Anîna van pêdivî û fikran ji bo "xaka muhtac", serobinbûnek pêk tîne. Bi qewlê Al-Azmeh (2003: 75) li wir serobinbûnek peyda dibe, huqûqnas dikeve şûna fuqeha, mamoste ciyê şêxê rîdirêj digire, rêvebir dikeve şûna qaziyê şerîetperwer û heta di şûna cin û şeytan, Yecûc û Mecûc û tedawiya bitilism de, zanistên siruştî, dîrok û cografya rûdine.

Çavdêriyeke giştî ye ku (Berkes, 2011; Tanpınar, 1985; Mardin, 1991) piştî têkçûnên leşkerî, xasma windakirina erdên Rûmeliyê û li ser Xirîstiyanên Balkanan zêdebûna nifûsa Rûsyayê, Împaratoriya Osmanî xwe mecbûr dîtiye ku pêşketinên li Ewrûpayê nas bike an wan werbigire. Ev bizava ku Tirk jê re "xerbbûn", "esrîbûn" an "ewrûpîbûn" dibêjin, li gor Ahmed Hamdi Tanpınar (1985: 37-63) belavî sê dewran dibe: Dewra pêşîn ji sedsala 18an dest pê dike û heta Şoreşa Fransayê diçe. Di vê dewrê de li aliyekî Ewrûpayek heye ku bi xêra Ronesansê xwe bi awayekî feyzdar îdrak kiriye û bi keşfên cografîk zindî û dewlemend bûye, ji zîhniyeta skolastîk û sîstema feodal xelas bûye û yekîtiya hişmendiyeke çandî pêk aniye û bi van tevan deriyê jiyaneke nû ji xwe re vekiriye. Li pêşberî vê dinyayê, împaratoriyek heye ku nîzama wî ya aborî, leşkerî û ilmî xera bûye, bi şer û serhildanan zeîf ketiye. Di nav vê rewşê de rîcala dewletê pêşî dest avêtiye sazkirin û îslahkirina artêşê. Ji ber ku li gor wan têkçûn di saziyên dewletê de bû, jiyana civatê li ser zemîneke manewî ya hêzdar dimeşiya, lewra guherîneke ku hemû jiyanê biguhere nedihat bîra kesî û pêdiviyeke wisa jî tunebû. Ji çavdêriyên sefîrên vê dewrê ("Sefaretname"ya Yirmisekiz Mehmed Çelebî) û ji rîsaleyên matbû ("Usûl-ul Hîkem fî-Nîzam-ul Umem"a Îbrahîm Muteferrîqa) daîm ev fikir dipengizîn: Geşedana ku li Ewrûpayê çêbûye xwediyê nîzamekê ye. Tê de ciyekî taybet ê artêşa muntezem û îteatkar heye. Di maweya duyem de (1789-1807) jî dîsa wergera kitêbên ku behsa "fennê herb a frengan" dike û di nav artêşê de pisporên Fransî, Îngilîzî û Prûsyayî îstixdam dike,

li dar in. Di vê maweyê de Selîmê III. di warê maliye, edalet û elbet artêşê de reforman didomîne. Ji sefîrên Wîen, Berlîn, London, Parîsê dixwaze ku ew daîm di rapor û layihayên (pêşnûma) xwe de ji bo "hemû ehvalên sûretî îdare, nîzama mulk û sehaya eskerî" serê xwe biêşînin û wan ji bo karên dewletê tehsîl bikin. Ji ber ku hemû derd avakirina artêşekê ye ku "bi teknîkeke muasir mucehhez" bûye. Di dewra sêyem de (1826-1839) êdî tekamûla fikrên rojavayî zûtir û rasterasttir nifûsî hemû astên jiyana împaratoriyê bûn. Kêşeya sereke êdî ne tenê li gor zanyariyeke Ewrûpî nûkirin û îslahkirina artêşê ye, kêşe guherîneke giştî ye li ser bunyeya civakê û manewiyeta însan. Di vê serobinbûnê de rola têkçûna teqez a bunyeya kevin jî heye: Ocaxa Yeniçerî rabûye, di şûnê de artêşa nû hatiye sazkirin, ji bo perwerdeya navîn ruşdiye hatine avakirin, dibistanên esrî hatine vekirin, ji bo tehsîleke Ewrûpî nêzîkî 150 xwendekar hatine şandin, li tibbiyeyê tedrîsateke Fransî hatiye qebûlkirin û tê de mamosteyên biyanî hatine wezîfedarkirin, teşkîlata posteyê hatiye damezrandin, rojnameya yekem a fermî hatiye derxistin û axir dewlet jî bi fermanekê îlan kiriye ku dê bunyeya xwe li gor rêbazeke Xerbî saz bike. Di vê navberê de ji mîmariya seray û koşkan bigire, heta peysaja baxçe, mobîlye, cil û berg, xwarin û xwaringehan, otêl û qehwexaneyan, di nav polê civatekê de bi rêya "teqlîd"ê be jî dîmena jiyaneke elefrengî peyda bûye. Bunyeya "kevin" ji holê ranebûye, ew di nav ruhê cemiyetê de bi awayekî kûr didome, lê ji hêza terkîbeke zindî jî dûr e êdî. Têkiliyên navbera pêkhateyên împaratoriyê jî sist bûne û ji qewîniya berê mehrûm in; Rûsyaya ku xwe bi teknîk û îrfaneke Ewrûpî perwerde kiriye zexm bûye û bi awayekî eşkere piştgiriya kêmineyên xeyrî-muslîm dike. Ji bo nifşekî ku bunyeya "nû" hezim bike dibistanên esrî (harbiye, tibbiye, muhendisxane, behriye) ava bûne. Van dibistanan çûna xwendekaran ji bo Ewrûpayê û vekirina saziyên fermî yên wergerê (Tercüme Odaları) teqîb kir, wisa bizava nûxwaz hêdî hêdî belavî civatê bû, rewşeke hişmend û îradî wergirt û kok berda (1985: 42, 54, 55, 64, 73).

Fermana Tenzîmatê îlankirineke fermî bû ku dê dewlet ji xeleka medeniyeteke sedsalan derkeve û bikeve nav xelekeke reqîb. Ji ber ku ev belge ne tenê di warên edlî, siyasî, leşkerî û îdarî de anîna esasên nû bû, di heman demê de anîna munasebet û mukellefiyeteke nû bû ji bo ferdan û dewletê. Bi wê re maf û selahiyetên hukimdar sînordar bûn ku ev yek di dîroka Şerq-Misilman de yekem teahûd bû ku hukimdar qebûl dikir ku dev ji îradeya keyfî berde. Ji aliyekî din ve îlankirina parastina can û mal û namûsê, di çarçoveyeke giştî de qebûlkirina mafên şexsî bû û bi vî rengî dewlet fikrên sereke yên Şoreşa Fransiz qebûl dikir (1985: 129-131).

Lê ev daxwaza Ewrûpîbûnê, di polîtîkayên perwerdeyê de zêdetir berceste dibin. Belê, beriya Tenzîmatê bûka saziyên maarîfê "medrese" ne. Mektebên Sibyan û di nav Serayê de Mekteba Enderûnê jî heta astekê cureyên medreseyan in. Karakterê van dibistanan dînî ne. Hal ew e ku bi Ronesansê re û piştî Şoreşa Fransiz, wekî ku

kêliyek berê hat ziman, perwerdê rengekî millî wergirt. Deriyê dibistanan ji hemû zarokên gel re vebû. Dersên tarîx, cografya, fizîk, zanistên siruştî û gramerê bi zimanê zikmakî hatin dayin û perwerdeya neteweyî bû karekî sereke yê dewletê. Bi dewra Mehmûdê II. re (Turhan, 1969: 153) li Dewleta Osmanî jî li gor formeke nêzîkî îro, bi bergeheke esrî dibistanên seretayî, navînî û bilind vebûn. Dîsa vebûna ruşdiyeyên mulkî û leşkerî, dibistanên îdadî, amadeyî û zimanî û îslahkirina yên heyî rastî vê dewrê tên.

Her çend perwerde xaleke destnîşankirî ya Fermana Tenzîmatê nebe jî, ji pratîka rîcala dewletê diyar e ku "ji bo suhûleta sanayî, ilm û marîfetê" xîretek heye. Sazkirina lijneya *Meclis-i Mearif-i Muwaqqat* û avakirina *Mekatib-i Umumiyye Nezareti*, îşaretên vê xîretê ne. Lijne bi mebesta berbelavkirina ilm û fennê û rêkûpêkkirina karên perwerdeyê hatiye sazkirin; lê mebesta nezaretê girîngtir e: Dawî li sulteya weqifan tîne, di şexsê mektebên sibyan de disîplînek tîne dibistanên seretayî, wan tabiê mecbûriyeteke herî kêm a 4 salan û herî zêde ya 7 salan dike û rê li pêşiya keçan vedike ku piştî dibistana seretayî bikaribin herin yên navînî jî (Ay, 2007: 24; Akyüz, 2001: 135). Yeka din di vê dewrê de wekî ya Ewrûpiyan, astên perwerdeya Osmaniyan jî ji dibistanên seretayî, navînî, amadeyî û bilind pêk tên. Mesela ruşdiye, ji bo ku ji dibistanên leşkerî tib û darul-funûnan xwendekar amade bikin, hatin damezrandin; bi belavbûna wan re di nav tebaya Osmanî de rêjeya xwendeyan zêde bû. Îdadî ji bo xwendekarên 11-14 salî yên ku dê herbiye û tibbiye tercîh bikirana hatin avakirin. Sultanî, ku Lîseya Galatasaraya îroyîn bû, ji bo ruhê serdemê bi mebesteke gelek tîpîk hatibû avakirin: Bila xortên muslîm û xeyrî-muslîm, di nav disîplîna mifredata Fransî de bi hev re bixwînin û jê nifşekî ku meyla wî li ser Ewrûpîbûnê ye derkeve (Ay 2007: 27-30). Darul-funûn[1] di asta bala de lingê dawiyê yê vê pergalê bû. Biryara avabûna wê di 1846an de hatibû dayin lê di sala 1863yan de ketibûn fealiyetê. Di wan de fizîk, kîmya, tarîx, cografya, matematîk, zîraet, mihendizî beşên sereke bûn û mamosteyên wan kesên Ewrûpî bûn an nifşek bûn ku di ciwaniya xwe de li Ewrûpayê li ber rehleya tedrîsateke frengî çok şikandibûn. Mesela di nav mamosteyên wê yên yekem de kesên wek Derwîş Paşa, Ahmed Wefîq Paşa û Xoce Tehsîn Efendî hebûn ku tev jî piştî techîzateke Ewrûpî vegeriyabûn welatê xwe. Hêviya ku ji perwerdeyeke nû diwelidî ji ber vê pêvidiyê bû: "Ji bo bextewarî

1 Di eslê xwe de darul-funûn, bi tibbiyeyê re beşeke xwendina bala ya dewra Osmanî bû. Li hemberî medreseyên otokratîk xwediyê naverokeke Rojavayî û dinyewî bû. Ji bo tebaaya Osmanî ya muslîm û xeyrî-muslîm hatibûn damezrandin ku ev kes dê di xizmetên qamûyî de bihatana îstixdamkirin. Yanî tam dewreke ku Dewleta Osmanî ber bi organîzasyoneke nû ya îdarî ya Ewrûpî ve diçû hatibûn avakirin. Lê digel vê pêdiviyê ji ber tunebûna bernameyeke rêkûpêk a perwerdeyê, muqaweta medreseyan, şandina xwendekaran ji bo Ewrûpayê û li wir vebûna dibistaneke heman erkî, hêza van dibistanan zeîf bû û di sala 1882an de bi temamî hatin girtin. (Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Akyüz, 2001; Kansu, 1930; Ay, 2007).

û refaha tebayê, di rêya tereqqiyê de em muhtacî dibistanên wisa nin ku cahaletê têk bibin, ilm û fen û hunerê hînî me bikin." Ev gotina ha di sala 1845an de ji devê Sultan Abdulmecîd derdiket (Karal, 1994: 182) ku ji sedrezam û burokrasiya dewletê dixwest ji bo kêşeyên perwerdeyê serê xwe biêşînin.

Hasilê kelam di serdema Tenzîmatê de Dewleta Osmanî ji aliyê perwerdeyê ve berê xwe daye Ewrûpayê û xwestiye sîstema wê di nav dibistanên xwe de *binecî bike*. Şandina xwendekaran ji bo dibistanên Ewrûpî bûye adetek û kesên ku ji wan mezûn in, bûne xwediyê kar û meqamên girîng.

## 4. TECRÛBEYA KURDAN

Ger taybetiyên sereke yên miletbûnê dîrok, erdnîgarî, ziman, çand û aîdiyeteke nasnameyî be, Kurd miletek in. Lê digel van taybetiyan Kurd ne di nav kategoriyekê de ne ku li wir mesela Fransiz, Îngilîz, Alman, Hind, Ereb, Faris an Tirk hebin. Çend teferûat hene ku Kurdan ji hin miletan cihê dike û wan daxilî kategoriyeke din dike.

Miroslav Hroch (2011: 30) ku derbarê hişyariya neteweyî de xebateke berawirdî kiriye, çêbûna miletên modern dike du beş: 1. Miletên serdest ango "mezin". 2. Miletên bindest ango "piçûk" ên ku pêşketina xwe *bi vejandineke netewî* bi dest xistine. Miletên vê kategoriya duyem jî xwediyê sê taybetiyan in: a. Yên ku gelê wî ji aliyê zûmreyeke biyanî ve tê rêvebirin. b. Yên ku xwediyê yekeyeke etnîk in, lê yekîtiyeke siyasî ya serbixwe ava nekirine. c. Yên ku ne xwediyê nerîteke edebî ya berdewam in û çalakiya wan a zimanî û edebî rastî dejenerasyoneke mezin hatiye.

Taybetiyeke din a van miletên piçûk jî ev e: Bi demên dirêj tabiê miletekî serdest bûne û vê tabi'bûnê ji bo her du aliyan karakterekî binyadî çêkiriye. Vê yekê jî ji aliyê berdewamiya pêwendiyên siyasî ve ji bo miletên bindest du beşên din welidandiye: a. Yên ku di tu serdemên beriya rabirdûyeke prekapîtalîst de nebûne xwediyê yekeyeke siyasî ya serbixwe. b. Yên ku di serdema feodal de xwediyê zûmreyeke rêvebir bûn, lê berî ku bibin miletekî modern serxwebûna xwe ya siyasî û hestên wê winda kiribûn (2011: 30).

Ger mirov bala xwe bide vê tesnîfê, tê dîtin ku ji bo miletên bindest/piçûk her du kategoriyên pêşîn ("a" û "b") baş li rewşa Kurdan tê: Ew ji aliyê zûmreyeke biyanî ve hatine rêvebirin û her çend xwediyê yekeyeke etnîk in jî ji yekîtiyeke siyasî ya serbixwe mehrûm in. Dîsa di kategoriya pêwendiyên siyasî de em lê dinêrin ku beşa "b"yê bi rewşa Kurdan re agengdar e. Ji ber ku Kurd berî dewra modern li ser axa xwe xwediyê mîrektiyên serbixwe bûn an ji aliyê beg û mîrên Kurd ve dihatin rêvebirin, lê jiholêrabûna mîrektiyên Kurdan re, bi merkezîbûna dewletên wekî Osmanî û Sefewiyan re, ji wesfê rêvebirina xwecih mehrûm man.

Bêguman her neteweyê bindest bi rêya “hişyarî” an “vejandin”ê nebûn miletekî modern. Bi gotineke din di dewra modern de her miletê piçûk li ser heman riyê şiklek wernegirt û heta îro nehat. Di serdemên modern de çêbûna miletan bi hişmendiyeke netewî ve têkildar e. Bêyî vê aîdiyetê, tesewira miletekî zehmet e. Lê em mecbûr in bipirsin ku ev hişmendiya netewî ango aîdiyet çawa çêdibe? Li gor Hroch (2011: 34, 35, 36) ew bi du pêkerên hevtemamker çêdibe: Ew pêvajoya ku li ser tesîrên civakî yên niştimanperwer zêde dibe û çavkaniyên fikrî yên ku berjewendiyên însanan li dor bernameyeke netewî dicivînin. Ev her du hêman hev temam dikin û bernameyeke netewî saz dikin ji bo berjewendiyên însanan. Û di vê kêliyê de ajîtasyona netewî ya ku hişmendiya netewî zêde dike, wekî parçeyekî bizava netewî kar dike. Ji bo serkeftina vê ajîtasyona netewî, şertên pêwîst ew in ku endamên miletên bindest amade be xwe pêbendî bernameya netewî bike û aîdiyeta wî jî ji ferqkirineke basît ber bi aîdiyeteke mezin a yekpare ve bimeşe. Pozîsyona niştimanperweran ango aktîvîstên netewî jî gelek girîng e di vê pêvajoyê de. Dîsa li gor Hroch (2011: 37, 40) jixwe endamên miletên piçûk pir zû û çalak bersiv didin ajîtasyona niştimanperweran. Di nav vê zûmreyê de kesên ku ji qatên bilind tên û di nav dezgehê dewletê de xwediyê mewqiyên bilind in jî hene; kesên ku wekî abûqat, diktor û rojnameger; yên ku di asta navîn de memûrên dewletê, muhendiz, mamoste, teknîker, mela ne jî hene. Ev zûmreya ku li dirhê ronakbîran dide, di serê sedsala 20an de li Stenbolê, di nav Kurdan de hebûn û wan tovê hişmendiyeke netewî reşandin.

Xala herî dawî ya vê behsê dewrên hişyarî û vejandina miletên piçûk e. Ev pêvajo xwediyê sê dewran e: Dewra A (dewra eleqeya akademîk), Dewra B (dewra ajîtasyona niştimanperweriyê) û Dewra C (dewra berfirehbûna bizava netewî). Li gor Hroch (2011: 51), ji bo rêveçûna miletên piçûk ber bi miletên modern ve, dewra herî girîng ya Byê ye. Ji ber ku di vê dewrê de niştimanperwerên ku di nav gel de belavkirina hişmendiya netewî girtine ser milê xwe peyda dibin.

### 4.1. Modernîzasyoneke Ronakbîr, Pozîtîvîst û Derengmayî: Peydakirina Şûr û Qelemê ji bo Pêşketinê

Miletê Kurd, bi salan di nav împaratoriyên mezin ên wekî Osmanî û Sefewî de, gelek caran di forma mîrektiyên serbixwe an otonomiyên herêmî de jiyana xwe berdewam kir. Dereng be jî wekî gelek miletan ew jî dema ku fikra netewetiyê li dinyayê belav bû li xwe hesiya. Di vê lixwehesînê de pêşengiya ronakbîran berbiçav e. Lewma ev rewş wek “şiyarbûn” an “vejîn”ekê dikare bê dîtin. Ev yek dengekî îstisnayî -Hacî Qadirê Koyî- ne tê de, rastî serê sedsala 20an tê. Elbet ne li Kurdistanê, li Stenbolê. Stenbol, mîna mekanekî guncav ê kolonyal xwediyê vê potansiyelê bû. Jixwe ji bo Kurdan şansekî din jî tunebû. Li Kurdistanê bajarekî ku bibe qibleya îtibarên siyasî û edebî, û tê de çapemenî, sermaye û ticaret bi pêş ketibe, bi polîtîkayên merkezîxwaz

ên Osmaniyan hatibû tunekirin. Lewma tovên hevçax ên vê şiyarbûnê, li ciyekî dûr, bi destê komeke *xwenda*[2] hat reşandin.

Bi rastî jî helwesta ronakbîrê Kurd di destpêka sedsala 20an de, taybetiyên Dewra A û Byê ya Hrochrew dihewîne. Ji ber ku di nav van kesan de bi qasî ku derbarê çand, edebiyat, ziman û dîroka Kurdan de meraqek heye, ewqas jî ajîtasyonek heye ji bo şiyarkirina Kurdan. Jixwe di dewra şiyariya netewî de wekî şertekî lixwehesînê, ronakbîr dixwazin rewşa welatê xwe di nav hezkirineke berpirsiyar de bînin rojevê. Ew ji vê yekê re guncav û dilxwaz in. Lewma pir rehet li ser pêdiviyên komeleyê bi cînaveke kolektîf (em) xeber didin. Ev yek bi devê Süleyman Asaf di *Hetawî Kurd* de (1914-4/5: 10) wiha hatiye îfadekirin: “Ez, tu û em hemû birayên hev, bi amrazên pêwîst re, bi projektorên ilm û fennê re, van belengazan ronî bikin.”[3]

Ne tenê hunereke wan ronîkirinê heye. Ronakbîr di tesbîta pêdiviyên manewî û peydakirina çareyan de jî xwedî feraset in. Ev yek jî bi devê ronakbîrekî Kurd, Kerküklü Necmeddîn ê vê demê (1913-1: 6/101) wiha hatiye ziman:

> “Kesên ronakbîr di fêmkirina îhtiyacên manewî yên qewmê xwe de, digel vê yekê di peydakirina çareya van îhtiyacan de zehmetiyê nakişînin. Seba ku weqfî mîzac û tebieta qewmê xwe ne, zûka tedawiya nexweşiyên wî yên manewî jî peyda dikin.”

Di eslê xwe de kêm jî be em dibînin ku di çend gotarên din de ronakbîrê Kurd ji erkê xwe haydar xeber dide. Mesela di vê behsê de dîsa Kerküklü Necmeddîn (1913-1:10/105) tîne ziman ku ger fikrên ronakbîran bên ba hev, dê yekûna van fikran di binyada civakî de Îslahetekê pêk bîne. Li gor Silêmanî Ebdulkerîm (1913-1: 20/115) mirov bi nûra perwerdeyê dema ji cehaletê rizgar bibe, dê bi saya behreya zanînê bo nimûne di karê ticaretê de serkeftîtir bibe, di muemeleya ticaretê de wekî frengan şareza bibe. Bulgaristanlı Doğan (1913-2: 3,4/135) ê ku gotara xwe pêşkêşî ciwanên ronakbîr ên Kurd kiriye, di wê baweriyê de ye ku di nav gel de wezîfeya ciwanan rêberiya rêya rast (îrşad) û ronakgerî (tenwîr) ye; di heman demê de bi kar û xebata ciwanên xwenda û ji dinyaya îroyîn hayedar, *miletê Kurd cardin dê bê vejandin, heta ji tunebûnê tê bê î’mal û çêkirin*.

---

2 Ev koma xwenda, ronakbîr in. Li vir bêyî nîqaşeke epîstemîk a ku hin ferqan dixe navbera “entelektûel” û “ronakbîr”, em têgeha ronakbîr di mahneya “kesê xwedî îdrak””,”kesê ku zîhna wî bi perwerdeyê ronî bûye” de bi kar tînin. Ev mahne nêzîkî “éclairé”ya Fransizî ye ku di zimanê Erebî de peyva “munewwer” û di Tirkî de jî “aydın” hevmahneya wê ye. Nexwe dema em li vir bibêjin ronakbîr, bila çalakiya kesekî xwedî-doz, kesekî ku li gor qenaetekê civatê araste dike, kesekî ku rastiyên dinyayê li ber civatê îfşa dike, bê bîra me. Jixwe dema em kar û kiryarên hin Kurdên xwenda yên dewra Stenbolê dinêrin, em dibînin ku kêm û zêde çalakiyeke bi vî rengî li pêşberî me ye.

3 "Ben, sen ve bütün kardeşlerimiz bu zavallıları lazım gelen vesaitle, ilim ve fen projektörleriyle tenvir edelim."

Ger di vejandina neteweyan û çêkirina civatên muxeyyel de îro rola ronakbîran ji aliyê gelek teorîsyenan ve bê bîra me, ev gotinên ku beriya 104 salan hatine serfkirin manîdartir dibin. Wekî din cardin li ber destan gotarek heye ku hem "lefzî" û hem jî "naverokî" teoriya Hroch a li ser ronakbîran û ew taybetiyên ku em îsnadî rola wan dikin, piştrast dike. Gotara ku dixwaze der barê azadiya miletan de "bi mutleqiya qanûnên matematîkê, bi mantiqeke nû ya li gor ezmûnê, bi çavekî zanistî" xeber bide, wiha didome:

"Digel van ew *miletên piçûk* ên ku dê nû bên damezrandin, beriya her tiştî divê xwe bi vê demê, bi zihn û fikrên munasibê jiyana demê mucehhez bikin. Ji bo vê yekê jî divê bi wan bernameyan dest bi kar bikin ku rêxistinên çandî pêk tînin û erbabê ilm, fen û sin'etê perwerde dikin. Li wî welatê ku fikra heq, fikra edalet û fikra jiyanê geş nebûbe, ne edalet, ne huqûq û ne jî jiyana siyasî çêdibe (Ahmed Vehbî, 1919-12: 15/545, îym).[4]

Ji aliyekî din ve mîna nimûneya lîberal û muhafezekar du cureyên modernbûnê hebin û di ya lîberal de bikerê modernbûnê bûrjûwazî û di ya muhafezekar de biker dewleta otorîter be (Vali, 2010: 53), ferqa modernbûna Kurdan ji ya Ewrûpî û der-Ewrûpî ev e: Di tunebûna çîna navîn û dewletê de, ronakbîr in bikerê modernbûnê (Alan, 2015: 52, 53). Tunebûna dewletê elbet ferqeke bingehîn dixe navbera ya Kurdan û gelên Tirk, Ereb û Îranî, lê entelijansiya Kurd jî (Abbas, 2010: 57) wekî ya van bi awirekî gelek pozîtîvîst nêzîkî modernbûnê bûye; di çavê ronakbîrê Kurd de jî modernbûn ji maf û huqûqê zêdetir, top, tang û balafir e, zanist û teknîk e.

Tekamûla vî ronakbîrê pozîtîvîst cara pêşîn li Stenbolê, di ber komek bûyerên siyasî û dîrokî de li ser xeteke bi vî rengî çêbûye: Di destpêkê de hin fîgûrên adetî (traditional) hene, ew ji nav arîstokrat û xasan tên û di nav civakê de xwediyê îmtiyazên şecereyî û olî ne. Xwediyê îmtiyazên şecereyî mîr û beg in; yên ku xwediyê hurmet û hêzeke olî ne jî şêx û mela ne. Bi gotineke din ronakbîrên Kurd ên adetî umera û ulema ne. Di serê sedsala 20an de li Stenbolê sebebekî hebûna wan pala xwe dide polîtîkayên merkezî yên Dewleta Osmanî. Wekî ku tê zanîn gava Dewleta Osmanî di şûna mîr û begên xwecih de waliyên xwe tayîn kir, li hêla Kurdan serhildan û nerazîbûn peyda bûn. Di encama van serhildanan de Kurd şikestin. Dewletê ji aliyekî ve ew sirgûn kirin, ji aliyekî ve di nav burokrasiya xwe de îstixdam kirin. Axir di serê sedsala 19an de li Stenbolê di nav burokrasiya dewletê de hebûna malbatên Bedirxanî û Babanan ji ber vê realîteyê ye. Lê ji vî nifşî çend kes hebûn ku ji rewşa

4 Binaenaleyh yeni teşekkül edecek ufak milletler, her şeyden evvel bu asır ile, hayat-ı hazıra ile mütenasib olarak zihnini,fikrini tecnîz ve tezyîn etmelidir. Bunun için de maarif teşkilâtı, ilim ve fen, sanat erbabı yetiştirecek programlar yapıp evvelâ oradan işe başlamalıdır. Hak fikri, adalet fikri, hayat fikri inkişaf etmeyen bir memlekette ne adalet, ne hukuk, ne de hayat-ı siyasiye olamaz.

nîjada xwe xeberdar û dûrî entegrasyoneke çandî bûn. Bi qewlê Aydınkaya (2010: 2017) ji wan hinek piştre bûn "figûrên arîstokratîk ên munewwer".

Ji aliyekî din ve zêdebûna nifûza alimên Kurd jî bi vê pêvajoyê ve têkildar e. Wekî ku hin lêkoler tînin ziman (Bruinnesen, 2010: 229; McDowall, 2004: 47) piştî têkçûna mîr û begên Kurdan, li Kurdistanê valahiya otorîteyê çêbû. Ev valahî, di pevçûnên eşîrî de rola hakemiyê bû. Eve ev valahî ji aliyê alimên Kurd ve hat dagirtin. Elbet sebebekî din ê çêbûna vê otorîteya nû xwe dispart du bertekan: Alerjiya li dijî fealiyetên mîsyoneran ên ku bi mebestên emperyal hatibûn Kurdistanê û tirsa zêdebûna reformên Ewrûpî (Bajalan, 2010: 51). Jixwe bi rêya milk hêza aborî ya şêx û melayan zêde bûbû, bi ser de tirsa ji Xirîstiyaniyê û biyaniyan, wek piştgirê jiyana berê îmaja alimên Kurd qaîmtir kir. Lewma qet xerîb nîne ku di vê dewrê de li Kerkûkê ji malbata Talebaniyan, li Silêmanî ji ya Berzenciyan, li Behdînanê ji ya Barzaniyan û li Şemzînanê ji ya Nehriyan birrek şêxên qadirî û neqşî derketin û bûn xwediyê nifûzeke mezin. Di vê serdemê de di nav şêx, mela, mîr, beg û serokeşîran de nîqaşa fikrên modern, ku der barê xwendin, vekirina dibistanan, îslahkirina elîfbayê, meraqa dîrokê, hemiyet û şecaeta miletî de bûn, pala xwe dide vê paşxaneyê.

Bêguman piştî reformên Ewrûpî, elîteke modern tev li vê asoyê bû. Ev kes di nav burokrasiya dewletê de ji warên wekî rojname (Süleymaniyeli Tewfîq, Ahmed Ramîz û Huznî Mukriyanî, Hemzeyê Muksî gerînendeyê rojnameyan û naşîr bûn), tib (Abdullah Cewdet, Şukrî Sekban doktor bûn), huqûq-mulkiye (Babanzade İsmail Hakkı, Ahmed Cemîl mulkiye; Mesûdê Silêmanî, Silêmanî Ebdulkerîm, Süleymaniyeli Tewfîq, Mevlanzade Rifat, Emîn Alî Bedirxan huqûq xwendibûn), leşkerî (Memduh Selîm wek serbaz tev li artêşê bûbû; Ekrem Cemîlpaşa ruşdiyeya eskerî xwendibûn) û me'mûriyeta dewletê (Xelîl Xeyalî muhesîbê fakulteya zîraetê bû, Hemzeyê Muksî mamosteyê mekteba seretayî bû) dihatin. Meşrûtiyetxwaziya ku sînorek dianî hukmê rêveberiyê û mafê welatiyan, xala wan a hevbeş bû. Li gor wan, kêşeyên mezin ên dewletê hebûn, lê çareserî di "ittihad-i anasır" de bû. Yanî bi "yekîtiya pêkhateyên Osmanî" ev kêşe çareser dibûn. Ji bo vê yekê jî Qanûna Esasî, yanî makezagonek ango rêkeftineke civakî, pêwîst bû. Qet nebe bi rêkeftineke wisa hemû pêkhateyên Osmanî digihîştin wekheviyeke qanûnî û dawî li îstibdad û rêveberiya keyfî dihat. Lewma di sala 1908an de qebûlkirina cara duyem a meşrûtiyetê, zafer û cejnek bû ji bo hemû muxalifên Sultan Ebdulhemîd. Di vê dewrê de Kurdperwerên nav Jontirkan, yanî "Jonkurd"ên Osmanî jî (Bajalan 2010: 85, 97) parçeyekî muxalefetê bûn. Wan jî ji bo Kurdan *tenwîr*ek dixwest. Tenwîreke ku bi şûr û qelemê pêk hatiye! Bi gotineke din, pêşketineke ku tê de ji bo miletê Kurd hînbûna hunera şer (teknîka leşkerî ya hemdem) û peydakirina mearifa cedîd (perwerdeya nû) ferz e. Qet nebe rewşa heyî wisa dikir ku ronakbîrên Kurd jî bikevin nav çalakiyeke nivîskî ya ku tereqqiyê bi vî

rengî telaqqî dike. Lewma di nav rojname û kovarên wekî *Kurdistan, Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi, Rojî Kurd, Hetawî Kurd* û *Jîn*ê de birrek gotarên wisa hene ku van her du meseleyan di nav terkîbekê de tîne rojevê: Pêşketin, hînbûna pîşeyên zemane ye û ew bi dibistanên esrî dikeve dest! Bi gotineke din emê bixwînin da ku pîşeyên vî zemanî hîn bibin û bi wan pêş bikevin! Yanî wekî pêdiviyeke serdemê bihevrebûna şûr û qelemê pêwîst tê dîtin. Pêşengekî vî nifşî Hacî Qadirê Koyî, di xezeleke xwe de ev rastî wiha dianî ziman: ***Şîr û qelem şerîk in lem esre da dirêxa/ Şîrîm qelemtiraş e û kalanî ye qellemdan.*** Bi rastî jî ev fêhm, naveroka bernameya nivîskî ya ronakbîrên Kurd baş ronî dike. Ji bo vê yekê emê hinek li armanca van sazî, rojname û kovaran binêrin, naveroka çend gotarên wan ên tîpîk neqil bikin.

**4.1.1. Kurdistan (1898-1902)**

Berî sazî û rojnameyên dema Meşrûtiyeta Duyem, mirov ji rojnameya yekem a Kurdî dest pê bike, baş dibe. Ji ber ku hêj bi jimara yekem a vê rojnameyê re rengê sereke yê dewrê derdikeve meydanê. Li ser kunyeya *Kurdistan*ê ev logo heye: “Rojnameya ku panzdeh rojan carekê bi Kurdî tê çapkirin Kurdan şiyar dike û teşwîqî perwerdeya pîşesaziyê dike.” Yanî tê de du erk derketine pêş: Rojname dê ji aliyekî ve Kurdan der barê halê wan û yê dinyayê *şiyar bike* û ji aliyekî din ve dê Kurdan *teşwîqî hînbûna pîşeyên sinaî yên serdemê* bike. Ev niyet, bi gotara xwediyê rojnameyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan re berceste bûye. Neqilkirina vê gotarê ya ku bi bismillahekê dest pê kiriye û hemû rojnameyê pêk aniye girîng e. Ji ber ku naveroka wê ya pozîtîvîst û îradî piştre ji aliyê gelek kesan ve dê bê dubarekirin. Li gor xwediyê nivîsê (1898-1: 3-10/111-118) der barê hînbûna ilm û merîfetê de gelek ayet û hedîs hene; li gund û bajarên Misilmanan “mekteb, medrese û cerîde” hene, lê Kurd ji vê yekê bêpar in. Her çend ew ji gelek qewman zêdetir xweyhiş û jîr bin, di dînê xwe de rast û qewî bin jî wekî qewmên din nexwenda ne, nedewlemend in û nizanin ka di dinyayê de çi dibe. Lewma dê rojname behsa qenciya ilm û merîfetê bike, li kuderê medrese û mektebên qenc hene dê wan nîşanî Kurdan bide, li kuderê şer dibe, dewletên mezin çi dikin û çawa şer dikin, ticaret çawa dibe dê rave bike. Heta niha mîr û axayên Kurd baş guh nedane emrê pêxember, zarok û mirovên xwe nedane xwendinê, di gund û bajaran de mekteb çênekirine... Seba ku ev kes rojnameyan naxwînin, nizanin ka li dinê çi dibe û karê wê çawa digere. “Mekteba Eşîra” ya ku li Stenbolê vebûye, niha fersendek e ji bo zarokên Kurdan, bila Kurd zarokên xwe bişîninê da ku ji wan jî me’mûr, miteserrif û walî derkevin. Kurd camêr û cesûr in, lê di “şer” de ev têrî mirov nakin. Îro top û tifingên ecêb derketine ku hewqas dûr diçin. Mirov nikare van top û tifingan bê mekteb û medrese çêke û biemilîne. Ger mîr û axayên Kurd baş fekirin dora xwe, dê bibînin sebebê feqîr û kêmiyê cehalet e. Ecemên cîran jî berê wekî Kurdan bûn. Lê wan jî dît ku “vî zemanî” bê xwendin nabe lewma niha ewladên xwe rêdikin “welatên dûr”, heta çend begzadeyên Ecem

niha li Stenbolê Mekteba Herbiyeyê dixwînin. Di şerê navbera Japon û Çîniyan de digel ku deh caran eskerê Çîn ji yê Japon zêdetir in jî şikestin, lewra Çînî cahil in, "nizanin top û tifingên vî zemanî" biemilînin. Dîsa her çend Sûdanî ji Misriyan cesûrtir û mêrtir bin jî seba ku nexwenda ne, hîleyên şerên vî zemanî nizanin, di destê wan de top û tifingên vî zemanî nînin, li ber misriyan dişikin. Bi saya mekteb û xwendinê, mirovên xweysin'et û hunerê, zanîna top û tifingan xelkê Misrê jî bi pêş ketiye; Kurdên vê derê seba ku cahil û nezan in dergevanî û xulamiya wan dikin. Lewma wezîfeyeke alimên Kurd jî ew e ku di mizgeftan de behsa xirabiya cehaletê, qenciya ilm bikin û zarokên xwe heta deh dozdeh salî bidin xwendin, hem xwendina mushefa şerîf û hem jî ya rojnameyan bizanibin.

Ji naveroka gotarê diyar e ku ronakbîrê Kurd jî pêşketinê wekî yên Osmanî, Misrî û Ecem, pêşketineke teknîkî ya leşkerî ango pêşketineke hunera şerî dibîne û fêm dike. Li gor vê fêhmê neteweyên ku di warê şer de bi pêş ketine serfiraz û serdest in; mirov çiqas xwediyê cewhereke pak be jî bêyî pîşeyên dewrê ev cewher betal û bêkêr e; deriyê van pêşketinan jî bi kîlîta "xwendin"ê vedibe. Ji bo çêbûna raya giştî jî pêdivî bi cerîde, yanî rojnameyan heye, ew asoya mirov fireh dikin û mirov ji dinyayê agahdar dikin.

Elbet di rojnameya *Kurdistan*ê de ev cure gotar pir in. Di ber kêşeyên rojane û siyasî de, teswîrkirina mehrûmiyeta Kurdan û rêya çareseriyê illeh naveroka gotaran domîne dike. Di jimara duyem de (Mîqdad M. Bedirxan, 1898-2: 2, 4 /122, 124) heman mesele tê rojevê û vê carê qenciya ilm û merîfetê bi hejêkirina welat (hubbul-weten) ve tê girêdan. Yanî hînbûna zanistekê ji bo xizmeteke giştî ya welat e: Hejêkirina welat ew e ku mirov ji bo zaroyên xwe mekteb û medreseyan ava bike, zaroyên xwe bide xwendin, sin'et û merîfetan hînî wan bike, kesb û karê ticaretê bizanibe, wek dijminên xwe bibe xweytop û tifingên vî zemanî da ku welat ji simên hespên Fileyan xilas bibe. Seba ku zemanek Emewî ji xwendinê hez dikirin û adîl bûn li Endulûsê serkeftî bûn, kengê dev ji van cewheran berdan, têk çûn. Sûdanî jî ji ber Misriyan ji heman sebebê têk çûn, her çend Sûdanî mêr û cesûr bûn jî ji ilmê şer xafil bûn û top û tifingên wan ên "zemane" tunebûn, lewma li ber leşkerekî hindik ê Misriyan serî tewandin.

Pêşketin, bêguman bi awayekî gelek vekirî, mîna gulvedaneke teknîkî ya leşkerî tê xwendin û fêmkirin. Me anîbû ziman ku ev yek, taybetiyeke modernîzasyonên der-Ewrûpî ye. Lê li vir hînbûna ilm û merîfeta ku gelek caran tê ziman û bi hedîsan tê qewînkirin, pirsek tîne bîra mirov: Gelo çarçoveya wê bi dîn ve sînorkirî ye? Bersiva vê yekê di jimara sêyem de eşkere dibe. Dema Mîqdad M. Bedirxan dibêje (1898-3: 2/132) bê ilm û merîfet, nimêj û rojî temam nabe û gazî alimên Kurd dike ku mîr û axayên Kurd rexbet û teşwîqî ilm û merîfetê bikin, çarçove wiha berfireh û sekuler dibe:

> "Vî zemanî de kitêbên we [wisa] qenc hatine nivîsandin, behsa xweykirina dewar û pezî dike, behsa çandina genim û cehî dike, behsa hemî tişta dike. Mirovên xwenda wê bikaribin bi van kitêba dewar û pez û dexlê xwe bike rê de. Her sal kara wî du cara wê zêdetir be."

Me di destpêka vê beşê de gotibû ku di tevgerên netewî yên vejînger de li cem ronakbîran eleqe û meraqek peyda dibe li ser çand, edebiyat û dîrokê. Ev yek di jimara duyem de jî didome. Rojnameya ku Kurdan şiyar û teşwîqî perwerdeya pîşezasiyê dike, "ji vir pê de bi ser daxwaza hin mîrên Kurdan dê cih bide edebiyata Kurdî jî". Lewma di nav rûpelên rojnameyekê de em rastî pratîkeke "xweser" tên. Tê de beşên mesnewiya *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî çap dibin. Diyar e ku beş bi beş (di 29 jimaran de) ji çapkirina wê meqsedek heye. Ew kitêbeke bêemsal e li gor xwediyê gotarê (1898/1991: 7/127), ji ber ku wî ji devê şahid alimên Tirk û Ereb bihîstiye ku di rêya hîsse û hîkmetan de ji vê kitêbê çêtir nîne; di naveroka wê de ji bo Kurdan hin cewher hene ku umeraya Kurd jî çapkirina wê xwestiye. Ji xeynî edebiyatê, heman meraqa ronakbîrî ji bo dîrokê jî heye. Bi riya rêzenivîsan nasandina dîroka hukumdarên Cizîrê, agahiyên li ser Kurd û Kurdistanê û danasîna figûrekî wekî Selahedînê Eyûbî, parçeyekî din ê vê meraqê ye.

Mirov dibêje qey Ebdurrehman Bedirxan sebebê siyasî yê cehaleta nav Kurdan baş fêm kiriye. Ji ber ku li gor wî (1900-26: 4-7/454-7) pergala ku Kurdan ji medeniyetê, nîmetên zanînê, zewqa azadî û serbestiyê mehrûm dike, wan halanî kuştina Ermeniyan dike û bi vî rengî şerefa wan lekedar dike, heysiyet û pêşeroja wan ji wan distîne, cehalet e û li pişt cehaletê jî mebestên qirêj ên îstibdadê hene.

Dîsa bi hin gotarên siyasî û civakî yên Ebdurrehman Bedirxan ên dewra duyem (1899-20:12/348; 1900-24:7/425; 1900-25:9/443), her wiha bi gotarên dewama *Kurdistan*a dewra meşrûtiyetê û piştî Şerê Cîhanê ku li ser destê Sureya Bedirxan derketiye (jimara 3 û 4an a 1909an û jimara 5an 1917an), em dibînin ku dîsa cih ji bo mijarên wekî nîmetên meşrûtiyetê; digel ciwanmerdî, azadperwerî, jîrî û mêrxasiya Kurdan li dinyaya siyasî û medenî sêwîbûn û bêpiştbûna wan; digel avadanî û dewlemendiya zemanên berê îro tunebûna rê, şemendîfer û mekteban; girîngiya perwerde û xwendinê, qîmeta hînbûna huner û sin'etê (Koç, 2013: 42) hatiye veqetandin.

**4.1.2. Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti û Rojnameya Wê (1908-1909)**

Di nav Kurdan de bergeha ronakger, esil piştî serkeftina muxalefeta li dijî Sultan Ebdulhemîd bergewde bû. Îlankirina meşrûtiyetê ji bo welatiyan rûdana azadiyê û cejna mezin a milet bû. Kurd jî wekî gelek pêkhateyên Osmanî ev roj ji çilexaneyê

derketin derve.[5] Qanûna Esasî, yanî rêkeftina civakî, di nezera vî nifşî de belgeyeke gelek biqîmet bû. Ev belge xwediyê çar ruknê esasî bû: Hurriyet (azadî), edalet (dadî), uxûwwet (biratî) û musawet (wekhevî). Digel vî karakterê Ewrûpî, ew li gorî emrê Xwedê û şerîeta Pêxember jî bû (Mehmed Tahir Cezerî 1909-6: 22/298). Ji ber ku îstibdad heram, lê azadiya însanan helal e. Lewma bi sînorkirina hukmê keyfî re û bi sazkirina wekhevî û edaletê re li seranserê welat "dîmenên bedew ên azadiya pîroz û ahenga serwerî ya yekem a milet" rû dabû (Ahmed Cemîl, 1908-2: 9/89). Kurdan jî bi hêviyên vê cejna azadiyê re rojname û kovar derxistin û komeleyên niştimanperwer damezrandin, bi rêya van amrazan "xwe nas kirin", çalakiyên çandî û edebî pêk anîn, di nav wan de ronahiyeke nû (Celil, 2013; Alakom, 1998) peyda bû.

Piştî *Kurdistan*ê, *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi* (KTTG) bû duyemîn zemîna fikr û berhemên modern. Ya rast cara pêşîn bi vê rojnameyê re çalakiyeke rasteqîn a rojnameyê rû da. Kadroya wê ya berfireh a ku ji kesên wek Süleymaniyeli Tewfîq, Diyarbekirli Ahmed Cemîl, Süleyman Nazif, Seyyah Ehmed Şewqî, Mehmed Tahir Cezerî, Süleymaniyeli Seyfullah, Malatyalı Bedrî, Babanzade İsmail Hakkı, Süleymaniyeli Fethî, Xelîl Xeyalî, Seîdê Kurdî, Diyarbekirli Mazharzade Mazhar pêk dihat, der barê rewşa Kurdan, pêkhateyên Osmanî û rûdanên dinyayê de agahiyên curbicur pêşkêş dikir. Rojname, elbet weşana *Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti* (KTTC) bû. Çapbûna "beyanname"ya KTTCê (1908-1: 6/40) armanca rojnameyê jî tayîn dikir: Komelê ji bo silametiya welat û milet, dê hukmên Qanûna Esasî biparêze; ji bo ku miletê Kurd bi pêdiviyên demê (ihtiyac-ı asrice) û bidestxistina perwerdeyê (tahsis-i maarifce) bigihîje asteke pêşketî û rewşeke bextewar (esbab-ı terakki ve saadet-i hali istikmâl) dê rê û rêbazan hîn bike û alîkar bibe ku miletê Kurd bi awayekî wekhev û şareza bi miletên din re xweş derbas bike.

Ruhê ronakger ê beyannameyê eşkere bû: Rêkeftina civakî, hukmê keyfî sînor dike û di nav însanan de wekheviyê pêk tîne; ji bo pêdiviyên serdemê, pêşketin û dilşadiyê perwerde lazim e. Yanî komele, ji bo kamilbûna welatiyekî hişyar û şareza dê "bixebitiya". Hê di jimara yekem de bi awayekî tîr û yekrû ev niyet bi gotara Babanzade İsmail Hakkı (1908-1: 10, 12/44, 46) diyar dibû: Qedera Kurd û Osmaniyan yek e, ew derbasî hev bûne, dewra îstibdadê ji her kesî re, lê bêtir jî ji Kurdan re xerabî aniye. Lêbelê xebat û xîret dê bibe berterefkirina van xirabiyan. Bi şev û roj xebat lazim e ji bo Kurdan. Dê ji kû dest pê bikin? Pêşî perwerde (mearif), piştre dîsa perwerde. Piştre? Elbet dîsa perwerde, dîsa perwerde, dîsa perwerde.

Ev cure dubare û aciliyet, di gelek gotaran de heye. Yek ji wan jî aîdî Seîdê Kurdî

5 Di jimara yekem a rojnameyê de helbesta vî kesê ku bi mexlesên M. Tevfik û Pîremêrd jî nivîsiye, bi vê beytê dest pê dike: Emro ke rojî cejnî hemûman e ser be ser / Kurdîj legel gelan le çillexane hate der (1908-1: 24/58).

(1908-1: 20/54) ye ku bi "Ey gelî Kurdan" dest pê dike û bi van şîretan didome: Di îttifaqê de quwet, di îttihadê de heyat, di biratiyê de seadet, di hukûmetê de selamet heye. Divê kabika îttihadê û şerîta muhebbetê qewî bê girtin ku mirov ji belayê xilas be. Û sê cewherên Kurdan hene: Îslamiyet, însaniyet û milliyet. Sê dijminên wan jî ev in: Yek feqîrî ye ku çil hezar hemalên Stenbolê delîlê wê ye. Ê duduyan cehalet û bêxwendinî ye ku hezar ji wan yek nikare "qazete" bixwîne. Ê sisêyan dijminahî û îxtilaf e ku ev edawet, quweta wan wenda dike û wan musteheqî terbiyeyê dike. Lewma çare ew e ku bi şûrê elmas sê cewher ji dest neçin û her sê dijmin têk biçin. Ew şûrê edlê mearif û xwendin e; ê duduyan îttifaq û muhebbeta millî ye; ê sisêyan ew e ku însan bixebite, mîna sefîlan ji qudreta xelqê hêvî neke û pişta xwe nedê. Wesiyeta paşî: Xwendin, xwendin, xwendin û destê hev girtin [piştgirî], destê hev girtin, destê hev girtin.

Heman perdeya şîretê, ku ew cureyekî ajîtasyona ronakbîrî ye, di hin gotarên Seyyah Ehmed Şewqî de (1908-1: 21/51; 1908-2: 19/99; 1908-3: 21/157) jî berdewam in: Tereqqî zanîna sen'et û mearif, xwendin û xweşderbaskirina welatiyan e. Îstibdad mirovan difetisîne, di îstibdadê de me'mûr, esker, dîn zeîf dibin; tiştê xweş azadî ye. Divê Kurd jî wekî welatiyên xwe yên File sen'et û ticaretê bizanibin. Divê li Kurdistanê fabrîqe, wapûr, rêyên baş hebin, bi Kurdî kitêb û rojname bên çapkirin, bi xwendina rojnameyan Kurd ji dinyayê agahdar bin. Ger xwedî-tifaq bin, bi saya exlaqê xwe yê baş (diyanet, sedaqet, zekawet û îffet) ji wesfên xeyrî-medenî xelas dibin. Lê ji tunebûna mearif û xwendinê, ji hindikiya sen'et û ticaretê milet perîşan û feqîr bûye. Sebebê hemû rewşên nebaş bêtifaqî ye û seba ku îdareya berê li dijî şerîetê bû, tebaya Osmanî paş ma û niha bi saya azadiyê (hurriyet) dê hemû xirabî def' bibin.

Bi rastî îfadeya "seba îdareya berê muxalifê şerîetê bû em wiha paş man" balkêş e. Ji ber ku em dizanin Ebdulhemîdê II. siyaseteke panîslamîst diajot û di dewra wî de meylên sekuler ne serdest bûn. Wê demê ji muxalifbûna şerîetê qest çi ye? Li vir ji aliyê fikrî ve tesîra vejîngerên Îslamî berbiçav e. Wan îstibdad wek pratîkeke li dijî şerîetê didîtin û meşrutiyet jî nêzîkî xulqê însan û pratîkeke Îslamî dihesiband. Lewma nivîskarên vê rojnameyê dema digotin "ev çar meh in (qest jê îlankirina Meşrûtiyetê bû) dînê Muhemmed ronahî (şu'le) daye hemû deran, şerîeta wî zulm, xedir, dizî, talan, xirabî û bêtifaqî heram kiriye û xweşderbaskirina welatiyan tewsiye kiriye", ruhekî esrî tev li Îslamê dikirin.

Mehkûmkirina îstibdadê û pesnê belgeya ku mafên welatiyan misoger kiriye, di nav vî nifşî de rewşeke tîpîk e. Li gor Xelîl Xeyalî (1909-8: 27-30/391-394) sebebê wêranbûna welat, sefaleta welatiyan û ji destçûyîna şahî û bextiyariyê, tev îstibdad e. Îdareya mustebîd, Kurd ji xwendin, ticaret û zîraetê mehrûm hiştiye û wan eşqiya nîşanî dinyayê daye. Niha ev kiryar tev, bi Qanûna Esasî pûç û betal dibin. Lazim e

Kurd ji Ereb, Tirk, Arnawûd, heta ji Rom û Fileyan îbretê bigrin, dibistanan vekin û arê nezaniyê ji ser zarokên xwe rakin, cewherê xwe bidin naskirin. Felata welat di îttifaq û xîretê de, di terikandina adetên berê de ye. Kurmanc nezan in, lê şêxên xwedanîqtidar û serokeşîrên sahibnufûz zana ne. Divê ev kesê zana delaletê (rêberî) bikin ji bo tereqqiya miletî.

Bi rastî jî gotinên wekî "adetên berê biterikînin û bila kesên zana ji bo pêşketina neteweyê rêberiyê bikin", ji bo rola daîmî ya ronakbîran gelek nasyar e. Dihat bawerkirin ku însanên zana û ji dinyayê xeberdar, pêşengiya fikrên nû dikin, ala pêşketinê radikin. Li vir Xeyalî vê rolê minasîbê ronakbîrên adetî dibîne û wisa bawer dike ku di nav gelê Kurd de tesîra wan zêdetir e.

Wekî din ji aliyê hinek şexsiyetên Kurd û ne-Kurd ve (Babanzade İsmail Hakkı, Erzincanlı Hamdi Süleyman, Seyyid Muhammed İsmetullah) perwerdeya li Kurdistanê hatiye rojevê. Li ser rêbaz û zimanê vê perwerdeyê, asta asîmîlekirin û materyalên mifredatê nîqaş çêbûne. Lê qeanet ew ku dersên vê perwerdeyê divê li gor ferq û xweseriyên Kurdan (Seyyid Muhammed İsmetullah, 1909-9: 11/439) be. Ger dersên dibistanên li Kurdistanê ne *li gor pêdiviyên herêmî û serdemî bin*, dê bi kêrî tiştekî neyên.[6]

"Pêdiviyên serdemê" jixwe xwediyê îstiqameteke diyar in; ew navê zanistên pozîtîv in. Dibistanên esrî dê mufredateke wisa îcra bikin. Ji bo dibistanên esrî û mezûnên wan îdealîzekirin jî heye di nav nivîsên hinek ronakbîran de. Mesela gotara Ahmed Cemîlê (1908-5: 5-6/231-2) ku piştre di dewra Komara Tirkiyê de dibe Tirkperestek, ji bo vê behsê nimûneyeke baş e. Nivîskar dema li ser navê komeleyê (KTTC) çûye Mekteb-i Tibbiye û temaşeyî piyesek kiriye, Îshak Sukûtî-i Kurdî hatiye bîra wî. Ev zat muxalifekî Sultan Ebdulhemîd bû û li sirgûnê miribû. Xwediyê gotarê Sukûtî mîna qurbanekî cejna azadiyê (meşrûtiyetê) bi nav dike û ji bo tibbiyeyê jî dibêje, ku di vê dewrê de ew sertaca dibistanên esrî ye, dergûşa kesên wekî Sukûtî û avahiya muhteşem a azadîxwazan e. Lê bi qasî van gotinan, piyesa ku navê wê "Hûşenk" e jî balkêş e. Hûşenk, berî her tiştî tê maneya "aqil, fikir û feraset"ê. Mijara wê jî ev e: Têkoşîna periyeke xwedînamûs, fezîlet û bêguneh li dijî hukimdarekî xodbîn û mustebîd. Xwediyê nivîsê bi termînolojiyeke ronakger dibêje ku ev piyes li dijî zilmê serkeftina edaletê, li dijî îstibdadê serkeftina azadiyê, li dijî tariyê serkeftina ronahiyê ye. Ger bê bîra me ku Ronakgerî xwe wek şerkerekî yeman ê li dijî tariyê pênase dikir, dê metafora li jorê manîdartir bê ber çavan.

Di rêzenivîsa "Kürdler ve Şecaat-ı Akvam"ê de jî [Kurd û Mêrxasiya Gelan] ku ji aliyê nirxên exlaqî ve xizmetî avakirina nasnameya netewî dike, cardin perwerde

6 Mekteblerde okunan dersler itiyacat-ı mahalliye ve zamana muvafık olmazsa, elbette istifade c - heti görülmez.

û xwendin derdikeve pêş. Li gor xwediyê wê Malatyalı Bedrî (1908-1: 19/53), du tiştên maqûl hene li cem miletan: Yek, xisletên ku ji afirandinê tên û ji dergûşê heta gorê di nefsa milet de dijîn. Dudu, wesfên ku bi rêberiya exlaq ji qaîdeyên medeniyetê, ji zanyariyên perwerde, huner û raya giştî çêdibin. Eve ew îftixara ku xisletên tabiî û wesfên gûzîde çêdibin li cem hemû miletan bi heman awayî peyda nabin. Arnawûd, merd, şervan û miletekî qewî ne. Çerkes jî dîsa sîlehşor, xwediyê exlaqekî saxlem in. Herçî Kurd in di warê mêrxasî û exlaq de metîntir in. Di dîroka wan a nenivîsandî de gelek nimûneyên mêrxasiyê hene. Ji wan xarîqeyan yek jî ew e ku jinên Kurdan di şer de derveyî karên jinaniyê tevdigerin, sistiyê nakin, çavê xwe ji tirsê nakutin, dikujin, tên kuştin û di şer de bi mêrê xwe re rastî derbên xedar tên. Ger li ser van wesfên qenc, zanyariyên marîfeta perwerdeyê, terbiyeya civakî û fikrî bê zêdekirin, dê ev gelê ronîdar (kavm-i tâbdar) ê ku ji sedsalan vir ve qet exlaqê xwe yê netewî neguheriye, dê zêdetir bi pêş bikeve (1908-1: 10/90). Kurd, ev miletê metîn (Bedrî, 1909-6: 11/287) dê li pey mîzaceke hercaî û exlaqekî sunî neçe, dê destûr nede ku tu kes tore û exlaqekî biyanî neqşî mejiyê wî bike. Kêmasî û şaşiya mezin a Kurdan, cehalet e. Bêguman her milet dikare meziyetên marîfeta ku bi zanîn û hunerê dikeve dest, bi ser yên fitrî ve bike û di nav daîreya medeniyetê de bigihîje cihên baştir û payeyên navdartir; ev yek bi "xîreta însan" re têkildar e. Kurd tenê "li gor demê" cahil in.

Di eslê xwe de mîna mijareke ajîtasyona netewî bi awayekî rasterast û nerasterast[7] birrek gotarên din hene der barê "perwerdeya neteweyê" û "xisletên qenc ên Kurdan" de. Hewce nîne naveroka wan jî bê neqilkirin. Jixwe komeleya KTTCê ji bo vê mebesta xwe ya sereke amadekariyek kiribû. Li gor ruhê serdema nû dixwestin biketana nav tevgerekê. Ev yek ji aliyê rojnameyên din ve jî, mesela *Horizon*a Ermenî (Neql. Celîl, 2013:70), dihat tomarkirin: Dê li Mekteba Meşrûriyetê Kurd zarokên xwe bi ruhê meşrûtiyetê perwerde bikin. Lêbelê wekî ku tê zanîn *Kürd Neşr-i Maarif Cemiyetî* [Komeleya Çapa Perwerdeyê ya Kurd] û dibistana modern a yekem a ji bo Kurdan *Mekteb-i Meşrutiyet* (Kürd Numune Mekteb-i İptidaisi) rastî nerazîbûnên Îttihatçiyan hatin û berî ku bikaribin li Kurdistanê organîze bibin, hatin girtin. Dîsa jî vîna wan a siyasî û civakî baqî ma: Xwestin ku pêşî li Stenbolê û dûre jî li Kurdistanê, di nav tebaya Osmanî (evlad-i vatan) de ji bo Kurdan perwerde û zanîna sin'etê dabîn û belav bikin, ronahiya milet (tenvir-i millet) pêk bînin.

Di vê rojnameyê de gotarên ku di navbera pêşketin û îslaheta leşkerî de têkiliyek datînin, aîdî Süleymaniyeli Fethî ne. Li gor vî kesî (1908-1: 15-17/49-51; 1908-2:

7 Gotarên wek "Kürdler ve Kürdistan", " Kürdçeye Dair", "Ey Gelî Kurdan", "Gelî Welatiyan", "Kürdistan'da Maarifin Tarz-ı Tensîk ve İhyası", "Weten û Îttifaqa Kurmanca", "Kürdistan'da Maarif" rasterast, ji van zêdetir gotar jî bi awayekî nerasterast qala girîngî û pêdiviya perwerdeyê dikin.

13-14/93-94) ji bo leşkeriyê bi qasî mêrxasî û metanetê, tekamûla teknîkên pêwîst ên leşkerî jî (funûn-u lazime-i askeriye) şert in. Ger Kurd di nav nîzamekê de bibin xwediyê teknîkên leşkerî, tu qewm wekî wan nikare bibe siwariyên baş. Jixwe ji ber war û fitratê xwe Kurd ji siwariyê re guncav in. Divê ev cure leşkerî baş bê pîlankirin. Di nav dewletên îro de tenê Rûsya bi yekîneyên Kazakan vê yekê baş dike. Osmaniyan jî bi vê modelê *Alayên Siwarî yên Hemîdî* pêk anîne. Lê ger ev yekîne jî mîna Kazakên Rûsî li cihê xwe nemînin, bi leşkerên din re heval û nas bin, merkezên wekî Stenbol û Edîrneyê bimînin û li hizûra lijneyên leşkerî bên perwerdekirin, di nav wan de *zabîtên muqtedîr û mekteblî* zêdetir bibin dê çêtir be. Her çend îro sîlehên agirîn (esliha-ı nariye) gihîştibe tereqqiyeke mezin jî hêj di nav xizmetên leşkeriyê de girîngiya siwariyan heye. *Îro bi derketina sîlehên kujer re li Ewrûpayê nîzama siwariyan guheriye, divê ya Osmaniyan jî biguhere.* Ew zabîtên ku çûn Rûsyayê 3-4 sal man û piştre vegeriyan, îro bê şewq û xîret bûne, tertîbata Alayên Siwarî jî kêm maye. Her çend di dawiya gotarê de îbareya "mâba'dı var" [dewama wê heye] hebe û hevoka dawî nîvçe mabe jî wekî gelek nimûneyên vê demê ev rêzenivîs jî temam nebûye. Lê ji nivîsê xweş diyar e ku di îslahkirin û nûjenkirina sinifa siwariyan de çav li reçeteyeke Ewrûpî digere. *Zanyariyên ku bi çûna deverên biyanî ketine dest*, divê bên tetbîqkirin.

Belkî jî gotara herî tîpîk a ku di navbera "perwerde" û "leşkerî"yê de têkiliyekê datîne, jê sentezek çêdike, ya Seîdê Kurdî ye. Di "Kürdler Neye Muhtaç?" [Kurd Muhtacî Çi ne?] de tê gotin ku (1908-2: 12-3/92-3) ji bo pêşeroja Kurdistanê du amraz pêwîst in: Yekîtiya netewî û perwerdeyeke ku digel zanistên dînî teknîkên dinyaya medenî jî hîn dike. Lê seba ku teknîkên Ewrûpî û perwerdeya nû bi zahirî malê ecnebiyan e; ravekirina hin kêşeyên teknîkî li çîrokên Îslamî nayên û ev yek însanên jirêzê dixe nav dubendiyan; hin pêşketinên teknîkî ji Kurdên ku kana her kemalê ji medreseyan dizane re ters e; û hin ehlê xwenda yê ku bi şiklî Îslamiyetê hîn bûne di hukimdayîna fenên me yên felsefî de dikevine nav wehm û gumanan, Kurdan ji fenên jiyana medenî û perwerdeya nû nefret kirine. Digel van jiyana koçerî, esabiyeta qewmî, bêhukûmetî û feqîriya ku malê hukûmetê ye, di nav Kurdan de bûne sebebê xerez û pevçûnan. Li gor Seîdê Kurdî bi riya dergehê mezin ê leşkeriyê, dibistan dê marîfetê bibe nav Kurdan, medreseyên riziyayî vejîne, digel ilmên dînî, teknîkên elzem ên medenî jî hînî alimên Kurd bike. Ger yekîtî qesrek be, leşkeriya ku her cure unwan û ferqê têk dibe jî xîmekî eslî yê zemîna wê ya muhkem e. Wê demê ger perwerde ronahiya yekîtiyê, çerxa jiyanê û jêdera xaza hewayî be, dê Alayên Eşîrî jî dibistana şayîk a fennê û fabrîqeyeke mezin a sanayiyê be.[8]

---

8 Seîdê Kurdî yê ku di dewra îstibdadê de li dijî Alayên Eşîrî/Hemîdî ye, ji ber atmosfera meşrûtiyetê wekî her kesî hêvîdar e ku dê ev alay jî bên îslahkirin û ji wan faydeyek çêbibe.

Bêguman di îfadekirina meramê de, bikaranîna hin peyv û rengdêran jî balkêş e ku ew çiqas nêzîkî ferhengeke ronakger û esrî ne: Ziya-yı maarif (ronahiya perwerdeyê), şua-ı elektrikiye (ronahiya karebayê) fabrika-ı sanayi (kargeha teknîkî), funûn-ı lazıme-i medeniyye (fenên pêwîst ên medeniyetê), hava gazı (xaza hewayî)... Di heman demê de ji bo perwerde û leşkeriyê danîna têkilî û dengeyeke bi vî rengî, parçeyekî nasyar ê bernameya modernîsazyonên der-Ewrûpî ye: Pêşketin karekî teknîkî/fennî ye û ev yek bi perwerdeyeke esrî bi dest dikeve!

Digel van, ronakbîrên vê demê hêza aboriya nû jî ferq kirine. Ji ber ku ji aliyê gelek kesan ve (M. M. Bedirxan, Ehmed Şewqî, B. İ. Hakkı, X. Xeyalî, Abdullah Cewdet) lazimiya hînbûna "ticaret"ê hatiye ziman. Em dizanin ku ticaret karekî kevin û domdar e. Nexwe çima pêdiviya wê ewqas tê dubarekirin? Diyar e ku ji ticaretê qesd terzeke cihê ye ji dewrên berê. Ya ku hînbûna wê wekî xwendin û pîşeyên sinaiyê ferz e, malê dewreke kapîtal e ku niha li Ewrûpayê bi çîna bûrjûwa re serdest bûye. Di ber hînbûna ticaretê de girîngiya avakirina şirketan jî tê ziman. Derketina pêş a hêza vê ticareta nû, bi şirketan dabîn dibe. Belkî ronakbîrên Kurd tam fêm nekirine ku hêza kapîtal çawa rû daye, li pişt vê hêzê têkoşîneke çînî ya çawa heye, lêbelê ferq kirine ku ji bo serdema wan ticaret çiqas lazim e.

Her çiqas Kurd, her ku daxilî daîreya Îslamê bûbûn li ber dînê xwe heta niha tu car asê nebûbûn û her ku bi rizaya xwe û bêîstila ketibûn nav daîreya Osmanî, lê tu car îxanet lê nekiribûn û cenazeyên Kurdan heta li binê sûrên Wienayê, kelehên Girîdê çûbûn jî (Süleyman Nazif, 1908-2 4/84); her çend "siya çiqilekî girîng a dara pak a Osmanî" (pak-i Osmanî'nin bir ğusn-ı mühimman-ı sayedarı) bûn jî (Babanzade İ. Hakkı, 1908-1: 10/44) ew tu car negihîştibûn huqûqeke însanî û îhtiyacên medenî; û ev çiqilê girîng jî hêdî hêdî hatibû jibîrkirin. Ew qewmê ku li dijî îstibdada Ebdulhemîd hevrêyê Osmaniyan bûn, tam ku di dewreke guncav de hatibû xîretê, xwestibû ku bixwîne û ji cehaletê xilas bibe, Tirkperestiya hukûmeta nû (Îttihat û Terakkî) jê re bû kelem.

**4.1.3. Hêvî û Kovarên Wê: Rojî Kurd û Hetawî Kurd (1913-1914)**

Nifşê nû yê piştî 1910an, ji ber hin sebebên siyasî û civakî, ji nifşê KTTCê radîkaltir û Kurdperwertir bûn. Di vê yekê de rola zêdebûna siyaseta Tirkperest ên Îttihatçiyan û astengkirina xebatên Kurdî û berhewabûna hêviyên ji Qanûna Esasî û meşrûtiyetê hebû. Lewma di nivîsên wan de em êdî rastî methiyeyên ji bo meşrûtiyetê û baweriya ji Osmanîperweriyê nayên; di şûna van de hêviyeke netewî ya ku berê xwe daye ciwanê Kurd heye. Di nav atmosfereke wisa de çend xortên li *Koleja Zîraetê* di sala 1912an de *Civata Hêvî* (Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti) ava kirin. Di nav van xortan de kesên wekî Qedrî, Omer û Ekrem Cemîlpaşa, Şükrü Sekban, Memduh Selîm, Fuad Temo, Cerrahpaşazade Zeki, Xelîl Xeyalî hebûn; piştre kesên wekî Mihemed Mîhrî, Mihemed Şefîq Arwasî, Hemzeyê Muksî, Evdirehîm Rehmî,

Baban Abdulezîz, Memduh Selîm, Mistefa Şewqî, Kerküklü Necmeddîn tev li wan bûn. Kokên wan ên civakî digihîşt zarokên xwenda û malmezinên Kurdan. Ji aliyê siyasî ve xwediyê meyleke dijmerkezî bûn. Wek ku Celîl jî tîne ziman (2013: 78) kar û barên ji bo perwerdeyê, şerê li dijî cehaletê, propagandaya fikra pêşketinê, di nav pîlanên wan ên pêşîn de bûn. Gotara “Gaye, Meslek” a ku mebesta kovar û saziyê xulase dikir (1913-1: 2-3/98-9) cih dida vê rewşa tîpîk: Di nav pêkhateyên Şerqê de her Kurd in ku ji ronahiya marîfet, medeniyet, ilm û irfanê mehrûm mane. Erê Kurd cahil in an cahil hatine hiştin; di welatê xwe yê sext û asê de hêj jî bi amrazên kevnare (îptidaî) cotyariyê dikin, jiyaneke nîvkoçerî didomînin, lêbelê bi îmkanên perwerdeyeke baş re, bi îstifadekirina nîmetên ilm û fennê re dikarin di demeke zû de bi pêş bikevin. Yanî niha wan jî ferq kiriye ku cahil mane û muhtacî zanîn û rêberekî zana ne. Ji vî gelê ku di kûrahiya ruhê wî de xezîneyeke payebilind (kenz-i ma'âla) heye, ji aliyê marîfet û medeniyetê ve divê bi hevdemên xwe yên esrî re eynî be! Kesên ku dê vê yekê pêk bînin ciwanên Kurd in. Ew dê nîşan bidin ku ji bo şarezatiya hevçax (medeniyyet-i asriyye) Kurd xwedî qabîliyet in. Ji bo vê mebestê (gaye), rêya (meslek) pêwîst jî tenê ev e: Riyeke zanistî û civakî ya ku ji îhtirasên siyasî azade ye (ihtirasat-ı siyasiyyeden azade bir meslek-i ilmi ve içtimai)!

Elbet yên ku ev kêmasî tev ferq kirine birrek xortên xwenda ne ku dixwazin qabîliyeta gelê xwe nîşan bidin ku ew jî ehlê tereqqiyê ne an ji pêşketinê re guncav in. Yeka din, “şertê mezin ew ku divê Kurd ji aliyê marîfet û medeniyetê ve bi hevdemên xwe yên esrî re eynî be”, îfadeyeke bi têra xwe modern e. Acîliyeta ku di serê sedsalê de hatiye ferqkirin bi vî nifşî jî berdewam e. Vê carê wekî muxateb “ciwanê Kurd” (Kürd şebabı) derketiye pêş.

Elbet di nava van de kêşeya acîl, dîsa perwerdekirina gelê Kurd bû. Kêşeyeke vê behsê jî îslahkirina elîfbayê bû. Vî nifşî ferq kiribû ku zarokên Kurdan bi elîfbaya heyî zehmetiyan dikêşin, li gorî zarokên frenkan gelek dereng hînî xwendinê dibin (Silêmanî Ebdulkerîm 1913-1: 21-23/117); ji bo ku rêjeya xwendayan herî hindik ji sedî derkeve çilî, divê terka tîpên (hurûf) kevin bê kirin, di şûna wan de yên nû ku zarokekî heft-heşt salî dikare mehekê de hîn bibe bê bicihkirin (Abdullah Cewdet, 1913-1:3-4/99); sebebekî paşmayînê ji teknîka modern (funûn-ı asriyye) curbecuriya şiklên tîpan e ku ji bo 6 herfan mirov nêzîkî 80 şiklên wan hîn dibe, hal ew e ku mirov rêjeya şiklê wan kêm bike, dê ji bo xwendekaran û karê matbaayê jî baştir bibe (Süleymaniyeli Mes'ûd, 1913-1:18/113); bi hêsankirina qiraet û tîpan re dê kesê herî cahil jî di 3-4 mehan de xwendinê hîn bibe (M. S. Azîzî/M. Salih Bedirxan, 1913-2: 12/144); bila şêx û melayên Mûsil, Diyarbekir, Bilîs, Wan, Erzirom, Sinê, Silêmanî, Kerkûk, Bexdad û Xerpûtê ser sebebên vê kêşeyê bifikirin ka çima zarokên heftsalî yên Îngilîz, Fransiz, Alman, Mosqof û Îtalyan di şeş heyvan de xwendin û nivîsandinê hîn dibin, lê yên Kurdan deh salan de jî weqfî zûxwendin û nivîsandinê

nabin (Modanî X. /X. Xeyalî, 1913-2: 29-30/160)... Heta li gor komeleya *Tamim-i Maarif ve Islah-ı Huruf Cemiyeti*, ku ji ber heman meseleyê ji aliyê birrek ronakbîrên Osmanî ve hatibû damezrandin, sebebekî paşmayîna Misilmanan kêşeyên elîfbaya wan bixwe bû (Rojî Kurd, 1913-2: 13-16/145-146). Heman mijar di *Hetawî Kurd* de jî berdewam e. Heta Mevlanzade Rifat (1913-2: 2-3) gavek wêdetir diçe û bê delîl dibêje ji bo hînkirin û xwendinê divê Kurd vegerin tîpên xwe yên qedîm, Urduyî. Li gor Rifat, Kurd û Ermenî neviyê qewmê Urdu-Urartu ne. Bi demê re Ermenî bûne Xirîstiyan û çand û baweriya wan guheriye. Niha ew di rêya tereqqiyê de gavek ketine pêşiya Kurdan; ji bo Kurd bigihîjin wan, zimanê xwe zûtir û rewantir bixwînin û bidin hînkirin, lazim e tîpên Urduyî vejînin û saz bikin, bi vê elîfabeyê ferhengekê û kitêbên rêzimanê binivîsin.

Ji aliyê din ve wergirtina ruhê serdemê dîsa di nav nîqaşan de cihekî sereke digirt. Ku ev nîqaş ji kêşeya jinê, heta fikra milliyetê, xweserî, di rêvebirinê de cudatiya quwetan û di çandinê de bikaranîna makîneyan dirêj dibû. Mesela wekî îslaha herfan, kêşeya jinê jî muhtacî îslahê ye. Li gor Ergani Ma'denli Y. C. (1913-4: 10-12/209-211) ger em bixwazin jina Kurd jî wekî ya Ewrûpî û Amerîkî, heta Japonî derkeve ser dika dîrokê û ji bo pêşeroja xwe bixebite, divê pêşî ji cehaletê, ji cehaleta ku ji destê mêran diqewime, xelas bibe. Her çend jina Kurd di nav daîreya Îslamê de ji aliyê tesetûr, kar û barên malê, statûya civakî, ger û geşt û şer ve serbest û rehettir, di pevçûnan de bêtirs û wêrek be jî, kêmasiya wê "ilm û terbiyeya esrî" ye. Ger li gor ruhê vê serdemê jina Kurd bê perwerdekirin, dê qewmê Kurd zûtir bi pêş bikeve. Ji bo miletan bi qasî qût, dayikên xwedî aqil û feraset jî lazim in. Rewşa jinên miletekî, pîvana asta pêşketinê ye.

Li gor xwediyê gotara "Derd ve Deva" (H. 1913-1: 7/102) ji bo ku Kurd xwe li ber lehiya bicoş a sedsala 20an bigrin û di nav girênekên wê de mehf nebin, tenê bendek li ber wan heye: Zanist û medeniyeta vê esrê. Yek ji van zanistan jî civaknasî (sosyolojî) ye. Civaknasiyeke ku bi "aqil" û "mantiq" tije, dikare nexweşiyên civakî teşxîs û tune bike (Kerküklü Necmeddîn, 1913-1: 9-10/105). Fikra neteweperweriyê ya ku li Ewrûpayê birrek guherîn aniyê pê, di nav alema Îslamê de jî belav dibe û hêvî ew e ku ew di nav Kurdan de jî "şiyarbûn"ekê bîne meydanê (Harputlu H. B., 1913-1: 8-9/103). Fikra milliyetê, wek parçeyekî qanûnên civakî îro di nav Kurdan de "dereng" jî be zuhûr dibe, bila beredayî alimên Îslamê muxalefeta vê fikrê nekin, ev fikir dê nebe sebebê tefrîqa û cudabûnê, dê aşitî û dilşadiyê bîne ji tebaya Osmanî re (Lütfî Fikrî, 1913-4: 2-5/202) Li gor Abdullah Cewdet (1913-2: 8-10/139) rêya herî bitesîr a yekîtiyê (îttihad) tefrîqa ye; madem Xweda di Qur'ana pîroz de dibêje me însanan mîna qewm û şûbeyên cihê cihê afirand da ku hev nas bikin, nexwe ne minasîb e ku mirov "yek ziman", "yek qanûn" û "yek muemele"yê li wan ferz bike; ji bo ku pêkhateyên Osmanî di nav yekîtiyekê de bin, lazim e li gor xasiyetên xwe

bijîn; ji bo vê yekê li Ewrûpayê mînaka Swîsrayê heye; ev dewlet ji 22 kantonan pêk tê ku her kanton ji aliyê milkî û îdarî ve serbixwe ye û digel ku ji sê qewmên cihê (Fransiz, Elman û Îtalyan) pêk tê û pir-mezhebî ye jî (Katolîk, Protestan, Ortodoks û Kalvenîst) di nava xwe de xwediyê yekîtiyekê ye; serdem, serdema milliyetan e û tu dewlet û hukûmet nikare pêşiya vê cereyanê bigire; îro Kurd jî dixwazin ziman û dîroka xwe binivîsin, şexsiyeta xwe ya netewî fêm bikin. Di nav vê dema nû de kar û barên dewletê jî dê bi usûleke din bimeşe. Îş ew e ku di rêvebirina dewletê de sînorên sê hêzên sereke (yasayî, rêveberî û dadî) bên parastin. Li gor M. Mîthed Bedirxanê ku (Mithad, 1913-1: 14-17/109) bi navê "Kuva-yı Umûmiyye-i Hükûmet" gotarek nivîsiye û tê de serî li fikrên Montesquieu dide, lazim e hêzên qanûnî, rêveberî û dadî ji hev cuda kar bikin da ku rê li pêşiya îdareya keyfî û despot bê girtin; ger ev hêz di destê yekî de bin, ew kes nikare bê kontrolkirin; ji bo ku azadiya civatê têk neçe, ev her sê hêz divê serbixwe bin.

Wekî din gotarên ku behsa têkiliya perwerde û pêşketinê, xêra xebat û xîretê, bikaranîna girîngiya xwendina rojname, zimanê Kurdî û nasîna dîrokê dikin, li hember van pêdiviyan rexne li sersariya serokeşîr û melayên Kurdan, gazind ji bêîmkanî û nîfaqên daîmî dikin, di *Rojî Kurd* de jî berdewam in. Madem di vê maweyê de roja îqbalê ji bo Kurdan jî hilatiye, bila erbabê hemiyetê bi hêza ilm û irfanê ehd û peymanên qewmê Kurd bibin serî. Madem çare perwerde (mearif) ye û ew jî bi qiseyan nabe, bi dibistanên seretayî, navînî û fennî (îptidaî, rûşdî û darûlfunûn) dibe, bila her kes li gor qama xwe bikeve nav tevgerê, zeman, zemanê se'y û xîretê ye. Ji bo naverokeke wisa bi rastî jî gelek nivîs hene, lê hewce nake li vir naveroka wan lib lib bên destnîşankirin. Jê neqilkirina naveroka çend libên tîpîk bes e ji bername û karakterê ronakger ê vê maweyê.

Mesela di gotara "Ziman" de Xelîl Xeyalî (1913-3: 20-22/186) hinek jî di bin tesîra fikrên Xanî û Koyî de gazî şêx, mela, xwendekar, mîr, serek û rûspiyên Kurdan dike ku ji bo pêşveçûn û mirovbûnê arîkariyekê bikin û rê nîşan bidin ku perîşanî û halxerabiya Kurdan ji holê rabe, Kurd bixwînin û rojnameyan derbixin... Piştre jî Xeyalî ji bo pêşveçûnê lîsteya îhtiyacan derdixe. Li gor wî îro Kurd muhtacî wan tiştan in: 1. Ji bo xwendin û nivîsandina lez îslaha tîpan, 2. Li ser terzeke nû elîfbayek, 3. Ji bo temamê zarên Kurdî ferhengek, 4. Ilmêhalek, 5. Dîrok û toreya bav û kalan, 6. Welat, adet, mîqdara eşîrên Kurdan, 7. Kitêba hesabê, 8. Ji bo zimanê Kurdî rêzimanek, 9. Tercûmeya halê mezinên Kurdan, 10. Edebiyata Kurdan û navê şairên wan. Û di ber van îhtiyacan de ji "dengbêjan berhevkirina lawjok, çîrok û qewlên pêşiyan".

Bi vî halî lîste xulaseyek e ji bo guftûgoyên vê demê: Îslahkirina elîfbayê, çêkirina ferhengeke zaravayên Kurdî û gramerê, kitêbên dîrok û çanda Kurdî, mezin û eşîrên Kurdan, berhevkirina nimûneyên helbesta klasîk û gelêrî... Eleqeya akademîk a ji bo hebûna maddî û manewî ya Kurdî di vê gotarê de gelek baş berceste bûye.

Diyarbekirli Fikri Necdet di gotara "Cotkarî"yê (1913-1:24-25/120) de cext li ser aliyê pozîtîv ê pêşketinê dike. Li gor wî her çend erdê Kurdan pir be, xuliya (ax) wê baş be û ava wê hebe jî Kurd bi qasî frengan dexil û genim hilnaynin. Ji ber ku frenk erdê xwe bi makîneyan cot dikin; yek diavêjin çil hiltînin. Îro ji nav wan gelek arvan, cil û pêdivî tên nav memleketê Osmanî. Ne şixulandina makîneyan, esas ev rewş şerm û guneh e. Bikaranîna makîneyan baş e, kî bibêje guneh e, derewan dike. Divê eşîrên Kurdan zarokên xwe ji bo cotkariyê (çandin û zîraetê) bişînin dibistanan. Dema erd bi makîneyan baş hat kolanê, dê bênder mezin bibin û paşil tije bibin.

Hinek ronakbîrên ku rasterast modelekê pêşkêş dikin jî hene. Elbet ev model ne li gor lêkolîneke dûvdirêj, li gor zanyariyên li ber destan hatine rojevê. Lê dîsa jî ji bo bergewdekirina pêşketinê û qiyasekê hebûna wan girîng e. Di vê behsê de ronakbîrekî pêşketina Almanan kiriye mijara nivîsa xwe. Li gor Kurdî (1913-4: 18/217) îro Alman, dev ji nîfaqên navxweyî berdane, di nava xwe de wekheviyekê durist kirine, dibistan ava kirine û kêşeyên perwerdeyê çareser kirine, di warê sin'etê de bi pêş ketine, lewma balafir û balonên wan li esmanan keşfa kaînatê dikin, di fabrîqeyan de karkerên wan bi mûçeyekî baş (sed lîre) kar dikin. Lê Kurd ji vê ilm û irfanê bêpar in. Hal ew e ku ew û Alman ji heman neslê ne û li gor Tirk û Erebekî Kurdek dikare zûtir (le zerfî dû manga) hînî zimanê Almanî bibe û ji Almanî li ser van pêşketinan kitêban tercûme bike.

Nameyeke ku cardin ruhê ronakger ê serdemê teslîm dike, rexneyek li adetên cografyaya Şerqê dike û li ber astengên demê wezîfeya ciwanên Kurd destnîşan dike, aîdî Harpûtlu H. B. (1913-2:11-12/142) ye. Li gor vî astenga li pêşiya hêza elektrîka jiyanê ya Kurdbûnê, adet û xurafeyên Şerqê ne. Ger ciwanên kurd bi saziya *Hêvî*yê re van astengan li dû xwe bihêle, dê di mahneya rasteqîn de pêş bikeve. Divê ciwan bi hişmendiya van nexweşiyên civakî bikevin nav xebateke şewqdar û hêvîdar. Û peyre divê di ber hesta millî de dîrok, adet, mûzîk û edebiyata xwe ya millî hîn bibin û bidin hînkirin; divê guh û çavên wan nifûzî "pêkerên esasî yên serdemê" (asrın avâmil-i esâsiyyesi) bikin.

Lêbelê ger ji aliyê retorîk û hişmendiyê ve em nivîseke ku metaforên ronakgeriyê zêde zêde himbêz dike bigerin, emê serî li "Le Tarîkî Bo Ronakî "ya Ehmed Muhsîn Ardelanî (Mihemed Mîhrî) bidin. Ji ber ku tê de hem şertên destpêanîna ronahiyekê tê nîşandin û hem jî di maneya Hrochrew de ji bo çand û edebiyata miletekî tê de eleqeyek heye. Li gor Ardelanî (1913-4: 21-22/220) *dema kemal û ronahiyê ji bo Kurdan jî hatiye*, dê bi mearifê jenga cehaletê ji nav xwe rakin, *bi nûra ilm û me'rîfetê ronî bibin*. Madem ji aliyê çend feqeyan ve Cemiyeta Hêvîyê ji bo armanceke wiha hatiye avakirin, bi ezm û sebat ev sê pêdivî pêk bên da ku Kurd jî *wekî hetawekî* berz bibin: 1. Teşwîqkirina himmet û bereketa şêx û aliman, 2. Berhevkirina şi'ir, edebiyat, dîrok û qewlê pêşiyan, 3. Qeydkirina î'ane û keleporê.

Ev bernameya ronakbîrî ya ku bênavber ajîtasyona netewî dike, bi merhaleya duyem a Civata Hêvîyê re, yanî bi *Hetawî Kurd* re jî karakterê xwe domand. Tê de mijarên mîna di rêya pêşketinê de daxwaz ji ciwan û alimên Kurd, sebebên paşmayînê, vekirina mekteban, bikaranîna Kurdî, qîmeta xebat û xîretê, danasîna hin figûrên dîroka Kurdî, Kurdayetî û hesta netewî, zeptkirina ruhê serdemê hwd. hatin guftûgokirin. Bêguman di beşên Kurdî de bi zaravayên Soranî û Kurmancî ji helbesta klasîk û nû nimûne jî hebûn. Mirov dikare bibêje ku Xelîl Xeyalî û Abdullah Cewdet naveroka gotarên xwe yên *Rojî Kurd*, neqlî vê kovarê jî kirin.[9] Lewma ne lazim e yek bi yek li ser van bê rawestîn. Lêbelê dîsa jî ji çend libên tîpîk bê behskirin, ji bo bergeha ronakbîrê Kurd û sinifa fikrên wî baş e.

Li gor Mihemed Mîhrî jî (Zehawîzade E. M./ 1913-1: 18) dewr, dewra şiyariyê lê ji ber tunebûna mekteban Kurd ji ilm û fennê mehrûm mane; huner û senayî di têkoşîna jiyanê de bi zanistê dabîn dibe û bi wê encax parastina jiyana maddî qabil e. Bê xîret cehalet ji meydanê ranabe. Ji bo vê yekê çi lazim e divê bê kirin: Îslahkirina elîfbaya Erebî ji bo Kurdî, nivîsîna kitêbên rêziman, vekirina dibistanên seretayî, di kar û ticaretê de teşebisa şexsî. Ger ev pêk neyên ji bo Kurdan di vê demê de mirina maddî û manewî nêziktir e.

Bi nezera Abdullah Cewdet (1913-1: 2-3) li Stenbolê bi çenebazî û qelemê, derxistina rojnameyan tiştek safî nabe. Kengê ciwanên Kurd berê xwe dan Anadolu û Kurdistanê, li wê derê qîma xwe bi nanê tarîgan û şîrê bizinê anîn, gund bi ronahiya medeniyetê îhya kirin, der barê qewmê Kurd de agahiyên curbicur bi dest ve anîn (nifûsa wan çi ye, li kû meskûn in, xwediyê araziyên çawan in, bi kîjan zenaetan mijûl in, rêjeya xwendayan çiqas e, miqdara kesên ku koçî Emerîkayê dikin çi ye, adetên xwe yên qewmî diparêzin an na, bi xîret û îradeya xwe heta niha çend dibistan vekirine, rêjeya zewicandin, jin berdan û zarok anînê çi ye, hwd.) û di şûna qeymeqam û midûrtiyê de qîma xwe bi mamostetiya dibistan gund anîn, dê wê demê rewanî rêyeke rast bibin.

Derdê Xelîl Xeyalî, ku di vê kovarê de bi musteara Babê Naco M. X (1914-4: 4-7) bi Tirkî jî nivîsiye, xwe-nenaskirin e. Li gor Xeyalîyê ku di paşmayîna Kurdan de daîma rexne û gazindan ji mezinên Kurdan dike, pênc sebebên sereke rewşa xirab kirine: 1. Ew Kurdên ku dev ji koçeriyê berdan û li bajaran meskûn bûn, Kurdbûna xwe ji bîr kirin û ji rola tenwîr û rêberiyê dûr ketin, 2. Ewên ku ji dibistanên fermî mezûn bûn û dest bi memûriyeta dewletê kirin Kurdên jar û bêçare ji bîr kirin, 3.

9 Bo nimûne gotarên Xelîl Xeyalî yên di Rojî Kurd de ("Ziman û Nezaniya Kurdan", "Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan", "Ji Mezinên Kurdan ra", "Gilî û Gazin") hatine nivîsîn, di Hetawî Kurd de bi heman naverok û heta sernavên nêzî hev, ("Ji Mezinên Kurdan ra ye", "Nezaniya Me", Derdê Kurdan", "Gazindeê Kurdan", "Erbab-ı Hamiyet ve Himmete", "Ji Qesîdeyên Hecî Rehmetî Têne Zanîn Ku") tên rojanekirin.

Ew zûmreya alimên Kurd ku pêşiya cehalet û xwînrijandinê digirtin, wezîfeya xwe neanîn cih, 4. Ew şêxên terîqetan ên ku wezîfeya îrşadê pêk dianîn, qîmeta yekîtî û biratiyê piştguh kirin, 5. Kurdên bajarî jî gundî jî zêde mil nedan hev ku dijminatî û xusûmetên nav xwe rakin. Yanî ew zûmreya dewlemend, alim, şêx û zana, ji bo bilindbûn û pêşveçûna memleketê xwe erkên xwe bi cih neanîn. Di encama vê yekê de dîrok, adet, jiyana civakî, karakterê netewî, ziman û edebiyata miletê Kurd di bin perdeyê de ma. Hal ew e ku biyanî, mesela Fransizan *Şerefname*yê wergerandine zimanê xwe, nimûneyên Kurdiya Baban û Kurmancî di zimanê Almanî de hene, îro li kitêbxaneya Londonê jimara berhemên Kurdî zêde bûye. Lazim e ev rewş wijdana mezin û ciwanên Kurd biêşîne û wan sewqî xîretê bike. Di dewama nivîsê de Xeyalî ji bo hin agahiyên jiyana civakî serî li berhema Şerefxanê Bedlîsî dide û jê behsa Kurmanc, Goran, Kelhur, Lor û Zazayan dike, der barê herêmên wan û zaravayên wan de agahiyan dide, ji bo pêşderazî û qenaetên şaş ên der barê Kurdan de jî gazî kesên xwedî himmet dike ku van şaşiyan rast bikin. Lê esil hevoka dawî gelek manîdar e: *Em xwe bizanibin*.

Xwezanîn jî parçeyekî ajîtasyona netewî ye. Ne wisa bûya Mihemed Mîhrî (Zehawîzade Y. Z.) zeîfbûna hesta netewî bi nezaniyê ve girê nedida. Li gor wî (1914-4: 7-8) nenaskirina fatîh, qûmandar, alim û şairên mezin ên Kurdan, bûye kelem li pêşiya hezkirina milet. Hal ew e ku ev hezkirin benekî hevpar e ji bo miletbûnê. Nenaskirina dîrokeke ku mirov ji figûrên wî îftixarê bike, li pêşiya yekîtiyeke wijdanî ya umumî, kamilbûn û bilindbûna miletî cezayekî manewî ye.

Wisa diyar e ku bi xwezanînê dê ferq derkevin meydanê ka ew netewe di çi halî de ye, dost û dijminên wan bi çi mijûl in, ji aliyê pêşveçûnê ve mesefaya ku derketiye meydanê dê çawa bê kinkirin, kêşe çi ne û rêya çareseriyê çi ye?.. Rojev bi van mijaran tije ye. Perwerde, ji bo perwerdeyê nivîsandina kitêbên rêziman, çêkirina ferhengeke hemû zaravayan, çareserkirina kêşeyên elîfbayê, naskirina dîrok, adet û edebiyata xwe, ji bo xwezanînê jî pêwîst in. Ger ronakbîrên Kurd gelek caran ji hev xeberdar an bêxeber van mijaran guftûgo dikin, sebeb pariyekî ew e ku vê xwezanînê di asta hişmendiyê de bikin sitûnek.

Reqabet û rikberiya navbera malmezin ên wek Bedirxanî û Babanan[10], bêîmkaniyên aborî, pêkutiyên îqtidara *Îttihat û Terakkî*yê, ku nivê nivîsên her du kovaran bi mustearên gelek veşartî hatine nivîsîn, bêhn li endamên *Hevî*yê teng kiribû. Lewma bi destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem re dema çûn eniya şer, xebatên wan bi carekê de sekinîn.

10 Ji bo hebûna vê reqabet û rikberiyê bnr. nivîsa "Dema Kalê Me, Çaxa Me, Dema Tê" (Xezal, 1913-1:26-28) û "Her Min Bim û Kesî Tirî Nî" (Silêman Ebdulkerîm, 1913-2:21-22).

## 5. ENCAM

Fikrên modern ên ku di nav Kurdan de peyda bûne, bi rêya gotarên hin ronakbîran çêbûye. Ev yek di nav daîreya modernîzasyonên Şerq-Îslamê de xweseriyek e. Ji ber ku Kurd ji îmkanên dewletê, ji rîcaleke ku pêdiviyên esrê bi tedbîrên dewletê pêk tîne, mehrûm in. Ev wezîfe maye li ser milê ronakbîran. Di modernîteyên lîberal de çîna navîn, di yên muhefezekar de dewlet biker be, di tunebûna van her duyan de bikerê modernîzasyona Kurdan ronakbîr e. Wek meyleke serdemê vî ronakbîrî bi ferhengeke pêbendî mîrasa Ronakgeriyê gazî miletê xwe kiriye ku bi rêya perwerde, meşrûtiyet û xwenasînê di her warê jiyanê de bi pêşketineke fennî, aqlî û îradî ruhê esrê zeft bike û bigihîje tenwîrekê. Ji bo vê yekê ronakbîrê Kurd komeleyên siyasî û çandî ava kiriye, bi kovar û rojnameyên van komeleyan xwestiye dengê xwe bigihîne xwenda û ciwanên Kurd. Lewma di ber mijarên wekî xelasiya cehaletê, avakirina dibistanan, îslahkirina elîfbayê, temamkirina materyalên mufredateke Kurdî, hînbûna pîşeyên sinaî, peydakirina amrazên sin'eta şer, naskirina dîrok û en'eneya Kurdî hwd. de çûye û hatiye. Gelek caran di ber xîtab, şîretkirin û acîliyetekê de ajîtasyonek li dar e. Seba ku ev ajîtasyon aliyê qenc û xirab ê qewmekî derdixe pêş û dixwaze xêreke kolektîf nîşan bide, ajîtasyoneke netewî ye. Ji xeynî vê derbarê çand, dîrok, ziman û edebiyata Kurdî de eleqeyeke berbiçav jî heye di van gotaran de. Ev yek jî destnîşan dikin ku di mahneyeke Hrochrew de ronakbîrên Kurd li serê sedsala bîstan ji sê dewrên hişyarî û vejandina miletên piçûk, du liban bi hev re îcra kiriye: Dewra A, dewra eleqeya akademîk û Dewra B, dewra ajîtasyona niştimanperweriyê. Dewra C, yanî dewra berfirehbûna bizava netewî, di vê maweyê de pêk nehatiye. Lê dîsa jî van her duyan têr kiriye ku hem hin fikrên modern ên rojavayî û hem jî tovên hişmendiyeke netewî di nav civata Kurd de belav bibin.

## 6. ÇAVKANÎ


Abdullah Cewdet (1913), "Hetawî Kurd Muharrirlerine", *Hetawî Kurd,* İstanbul, 1, 2-3.

Abdullah Cewdet (1913), "Bir Hitâb", "İttihad Yolu", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1, 3-4/99-100; 2, 8-10/139-141.

Abdurrahman Bedirxan (1900), "Kurda Re", *Kurdistan 1898-1902*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, cild II, Uppsala, 1991: Deng, 26, 4-7/454-457.

Ahmed Cemîl (1908), "Milletin İlk Şehrayîn-i Arûs-ı Hakimiyeti", "Tıbbiyelilerin Sahne-i Temâşâsını Ziyaret ve İshak Sükûtî-î Kurdî'ye Selam", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 2, 7-9/87-89; 5, 5-6/231-232.

Ahmed Vehbî (1919), "Hürriyet-i Akvam Hakkında Bir Fikr-i Felsefî", *Jîn*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1996, Cild III, Uppsala: Deng, 12, 14-15/544-545.

Akyüz, Yahya (2001), *Türk Eğitim Tarihi, Başlangıçtan 2001'e Türk Eğitim Tarihi*, İstanbul: Alfa.

Alakom, Rohat (1998), *Eski İstanbul Kürtleri 1453-1925*, İstanbul: Avesta.

Alan, Remezan (2015), *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*, Stenbol: Peywend.

Al-Azmeh, Aziz (2003), *İslamlar ve Moderniteler*, werger: Elçin Gen, İstanbul: İletişim.

Anderson, Benedict (1995), Hayali Cemaatler, werger: İskender Savaşır, çap 2, İstanbul:Metis.

Ay, Mehtap (2007), *Paris Mekteb-i Osmanisi'nin Kuruluşu, Amaç ve İşlevi*, Ankara, teza lîsansa bilind a çapnebûyî.

Aydınkaya, Fırat (2010), "Golgotha Tepesinden İnmenin Arifesinde Vicahiye Çevrilmiş 'Kürt Modernleşmesi Eleştirisi'", İstanbul, *Dipnot,* 1, 205-225.

Babanzade İsmail Hakkı (1908), "Kürdler ve Kürdistan", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 1,10-12/44-46.

Bajalan, Djene Rhys (2010), *Jön Kürtler*, werger: Burcu Yalçınkaya, İstanbul: Avesta.

Berkes, Niyazi (2011), *Türkiye'de Çağlaşlaşma*, çap 16, İstanbul: YKY.

Berman, Marhsall (2003), *Katı Olan Her Şey Buharlaşıyor*, werger: Ümit Altuğ- Bülent Peker, çap 6, İstanbul: İletişim.

Bruinnesen, Martin van (2010), *Ağa, Şeyh ve Devlet*, werger: Banu Yalkut, çap 6, İstanbul: İletişim.

Bulgaristanlı Doğan (1913), "Milletinize Karşu Vazifeniz", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 2, 2-5/134-136.

Celîl, Celîlê (2013), *Kürt Aydınlanması*, çap 2, werger: Arif Karabağ, İstanbul: Avesta.

Dabashi, Hamid (2008), *İran: Ketlenmiş Halk*, werger: Emine Ayhan, İstanbul: Metis.

Ergani Madenli Y.C. (1913), "Kürdlerde Kadın Mes'elesi", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 4, 10-12/209-211.

Fikrî Necdet (1913), "Cotkarî", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1, 24-25/120.

Giddens,Anthony (2010), *Modernite ve Bireysel Kimlik, genç modern çağda benlik ve toplum*, werger: Ümit Tatlıcan, İstanbul: Say.

H. (1913), "Derd ve Devâ", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1, 7-8/102-103.

Harpûtlu H.B. (1913), "Hêvî'den Ümidimiz", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 2, 11-12/142.

Hroch, Miroslav (2011), *Avrupa'da Milli Uyanış, toplumsal koşulların ve toplulukların karşılaştırmalı analizi*, werger: Ayşe Özdemir, İstanbul: İletişim.

Jusdanis, Gregory (1998), *Gecikmiş Modernlik ve estetik Kültür, milli edebiyatın icat edilişi*, werger: Tuncay Birkan, İstanbul: Metis.

Karal, Enver Ziya (1994), *Osmanlı Tarihi V*, Ankara: Türk Dil Kurumu.

Kerküklü Necmeddîn (1913), "Kürd Talebe Cem'iyyeti ve Kürdlerin Makam-ı Hilafete Hıdmetleri", "Ahvâl-ı İctimâ'iyyemiz", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1, 5-6/100-102; 1, 9-10/104-105.

Koç, Yener (2013), "Kürdistan Gazetesi (1908-1909) Birkaç Not", *Kürt Tarihi*, Sayı: 8.

Kurdî (1913), "Esl û Neslî Kurd", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 4, 18-19/217-218.

*Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi 1908-1909* (1998), amadekar: M. Emîn Bozarslan, Uppsala: Weşanxana Deng.

Loo, van der Hans-Reijen, van Willem (2006), *Modernleşmenin Paradoksları*, İstanbul: İnsan

Lütfî Fikrî (1914), "Kürd Milliyeti", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 4, 2-5/202-204.

M. Salih Bedirxan (M. S. Azîzî) (1913), " Hurûfumuz ve Teshîl-i Kırâ'at", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 2, 12-13/143-144.

Malatyalı Bedrî (1908), "Kürdler ve Şecaat-ı Akvam", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 1, 19/53.

Mardin, Şerif (1991), *Türk Modernleşmesi* (Makaleler 4), İstanbul: İletişim.

Mc Dowall, David (2004), *Modern Kürt Tarihi*, wer. Neşenur Domaniç, İstanbul: Doruk.

Mehmed Tahir Cezerî (1909), "Gelî Birakên Ezîz û Gelî Kurmanca", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 6, 20-22/296-298).

Mevlanzade Rifat (1913), "Muhterem Hetawî Kurd Gazetesi Müessislerine", *Hetawî Kurd,* İstanbul, 2, 2-3.

Mihemed Mîhrî (Ehmed Muhsîn Ardelanî) (1913), "Le Tarîkî Bo Ronakî", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 4, 21-22/220.

Mihemed Mîhrî (Zehawîzade E.M./Zehawîzade Y.Z.) (1913/1914), "Se'y Bikeyn", "Kürdlerde Hiss-i Milli", *Hetawî Kurd,* İstanbul, 1,18; 4, 7-8.

Mîqdad Mîdhet Bedirxan (1898), "Bîsmîllahîrrahmanîrrehîm", ""Bîsmîllahîrrahmanîrrehîm", *Kurdistan 1898-1902*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, cild I, Uppsala, 1991: Deng, 1, 3-10/111-118; 2, 1-6/131-136.

Mithad (1913), "Kuvâ-yı 'Ummûmiyye-i Hükûmet, Sûret-i Zuhûru, Lüzûm-ı Tefrik ve Muvâzeneti, Bu Husûsdaki İhtilâlât-ı Efkâr ve Bu Bâbda Olan Nazariyyâd", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1,14-17/109-112.

*Rojî Kurd 1913* (2013), (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, İstanbul: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.

Russ, Jacqueline (2011), *Avrupa Düşüncesinin Serüveni: Antik Çağlardan Günümüze Batı Düşüncesi*, werger: Özcan Doğan, Ankara: Doğu-Batı.

Seîdê Kurdî (1908), "Kürdler Neye Muhtac?", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 2:12-3/92-93.

Seyyid Muhammed İsmetullah (1909), "Kürdistan'da Maarif", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 9, 11-12/439-440.

Silêmanî Ebdulkerîm (1913), "Mindal Bo Çî Zû Fêrî Xwendin Nabê", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê,1, 21-23/116-118.

Süleyman Asaf (1914), "Kürdlük İçin", *Hetawî Kurd*, İstanbul, 4/5:10.

Süleyman Nazif (1908), "Kürd ve Kürdistan", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 2, 3-4/83-84.

Süleymaniyeli Fethî (1908), "Aşayir Askerliği", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 1, 15-17/49-51; 2, 13-15/93-95.

Süleymaniyeli Mes'ûd (1913), "Hurûfumuz ve Teshîl-i Kırâ'atı", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1, 18/112.

Therborn, Göran (1999), "Modernlik Yoluyla Modernliğe Gidilen Yollar", dnd. *Postmodernizm ve İslam, Küreselleşme ve Oryantalizm*, (amd.) A. Topçuoğlu-Y.Aktay, Ankara: Vadi, rr. 58-81.

Touraine, Alain (2004), *Modernliğin Eleştirisi*, werger: Hülya Tufan, çap 5, İstanbul:YKY.

Turhan, Mümtaz (1969), *Kültür Değişmeleri*, İstanbul:?

Vali, Abbas (2010), "Kürt Aydınları Modernleşmeye Pozitivistçe Yaklaşıyor", İstanbul: *Dipnot*, 1, 43-58.

Weber, Max (1993), *Protestan Ahlakı ve Kapitalizmin Ruhu*, werger: Zeynep Gürata, Ankara: Ayraç.

Xelîl Xeyalî (1909), "Weten û Îttîfaqa Kurmanca", *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi*, werger û tîpguhêzî: M. Emîn Bozarslan, 1998, Uppsala: Deng, 8, 27-31/391-395.

Xelîl Xeyalî (1913), "Ziman û Nezaniya Kurdan", "Ziman", *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 2, 29-30/160; 3, 20-22/186.

Xelîl Xeyalî/Babê Naco (1914), "Erbâb-ı Hamiyyet ve Himmete", *Hetawî Kurd*, İstanbul, 4, 4-7.

## Extended Abstract

Non-European modernization is the modernization which emerged outside Europe by means of import and through imitation. That is, modernization outside Europe passes as the name of the process of the desire and effort to reach the European level of development. In such regions modernization is certainly the result of a deliberate behaviour; modernization just doesn't simply happen in society; rather, it is attained in a society due to the efforts of a bureaucratic and military elite or by the activities of the intellectuals of a nation.

Because modernization in question suffers from the lack of the facilities and tools of a western modernization, they are in a hurry. This haste is because of lagging behind. The nations which become aware that they lagged behind the developed ones compensate for this by searching for an effort and work. In some models, agitation is necessary for this work and effort. In exactly these occasions, the role of the intellectuals come forward; because the Kurds neither have a bourgeoisie in the sense of the European one nor have a nation-state and its accompanying personnel in the sense of the Eastern states which would otherwise establish the ideals of this development. Instead of these two, Kurds have some intellectual figures who make an effort by writing.

From the beginning of the 20th century until the First World War, what we have witnessed is that Kurds attained some European frame of thought due to the efforts of these intellectual figures. These thoughts spread through political associations. Writings that are published in the newspapers and journals of these associations as "social articles" served to raise the ideals of intellectuality. According to this, development is a scientific, technical and military improvement. This development is obtained by mind, by establishing a clever society, the rights of human and citizens, the law, the natural law, constitutionalism and by opening schools. That's why, the context of articles of these intellectuals have been ending illiteracy, opening schools, improving the alphabet, finding the materials for Kurdish syllabus, learning industrial works, providing the instruments for the art of war, learning about the history and tradition of Kurds etc.

Within the rhetorics of these articles is giving an effort to impart a sense of reprove and urgency. Because raising awarenes shows the good and bad sides of a society, it is a type of national agitation. But in addition to this, there is a significant interest in Kurdish culture, history, language and literature. All these indicate that in a Hrochean sense, from the beginning of the 20th century Kurdish intellectuals have practiced two out of three periods of renaissance and reviving of the small nations together: Period A, period of academic interest and Period B, period of the agitation of patriotism. The modern ideas came about together with national awareness and this awareness involves curiosity about Kurdish culture and history and an agitation for the moral and national values. The distributers of this idea are intellectuals and these intellectuals belong to the intellectual heritage of the Enlightenment.